Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1346 28-Çile-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Berxwedaniya Kobanê tê nûkirin

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Bajarê Kobanê careke din bi dorpêçkirinê re rû bi rû ye, dîmenek ku dorpêça çeteyên DAIŞ'ê tîne bîra mirov, ji ber ku bajar şeş roj in di bin dorpêçeke dijwar de dijî. Tevî vê rewşa dijwar jî îradeya gel li ser van rewşan serdikeve û bi biryar e ku planên qirkirinê têk bibe.**



Çeteyên Hikûmeta Demkî ya Sûriyê, demek kurt piştî êrîşên xwe yên li ser Şêx Meqsûd, Eşrefiye û Benî Zêd, êrîşî Reqa û Dêra Zorê kirin. Bûyerên bilez ên li herêmê diqewimin rasterast hebûna Kurdan tehdît dikin, ji ber vê yekê wan çarçoveya êrîşan ber bi Kobanê û Hesekê ve berfireh kirin. Lê belê, gel bi awayekî xurt berxwedana xwe didomîne û bi rihê şerê gelê şoreşgerî tevlî seferberiya giştî bûye.

Bajarê Kobanê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji dema bidawîbûna dorpêça 2014"an û vir ve yek ji demên xwe yên herî dijwar dijî, ji ber ku îro vedigere da ku bi rastiyek dijwar a tecrîd, qedexe û dorpêçkirina zêdebûyî ya ji hêla Hikûmeta Demkî ya Sûriyê ve rû bi rû bimîne, di dîmenek ku ezmûnek dijwar ku bandorên wê hîn baş nebûne vedigerîne bîra kolektîf a bajêr. Ji 20'ê Çileyê ve, bajarê Kobanê dîsa ketiye dorpêçeke neragihandî, di nav êrîşên dijwar ên berdewam û qutkirina hema bêje tevahî ya pêdiviyên bingehîn de, ku bajar û niştecihên wê xistiye ber ceribandineke nû ya hebûnê.

### Dorpêça 2014"an

Ev rastî bixweber dorpêça yekem a ku Kobanê di krîza Sûriyeyê de jiya tîne bîra mirov, dema ku çeteyên DAIŞ'ê di sala 2014"an de êrîşeke berfireh kirin da ku bajêr bi dest bixin û ji cihê wê yê stratejîk sûd werbigirin. Dorpêç di havîna heman salê de dest pê kir û di meha Îlonê de gihîşt lûtkeyê. Dema ku çeteyên DAIŞ'ê piştî ku bi dehan gundên derdorê kontrol kirin, bi çekên giran û bi piştgiriya Tirkiyeyê bajar ji sê aliyan ve dorpêç kirin. Di wê demê de, Kobanê rastî topbaran û şerên bêhempa hat ku bû sedema koçberbûna bi deh hezaran sivîlan ber bi Bakurê Kurdistanê ve. Di heman demê de hejmarek ji niştecihên bajêr li kêleka şervanên ku parastina wê dikirin man.

Di wê dorpêçkirinê de, Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) bi çavkaniyên sînorkirî, bi şerê kolanan û berxwedana rasterast di nav taxan de, erkê parastina bajêr girtin ser milê xwe. Berxwedana Kobaniyê di wê demê de bû xaleke werçerxê ya herêmî û navneteweyî, ji ber ku berxwedanê bala gelek kesan kişand. Şervanan berxwedan û sebir nîşan dan û alîkarî kir ku dorpêç hêdî hêdî bişke, heta ku bajar di Çileya 2015"an de piştî şerekî dijwar û berxwedaneke bêhempa ku nêzî çar mehan dom kir bajarê Kobanê bi temamî ji çeteyan hate rizgarkirin.

### Vegera Dorpêçkirinê

Îro, piştî zêdetirî deh salan ji wê berxwedanê, Kobanê careke din bi dorpêçkirineke giran re rû bi rû ye. Dorpêçkirina heyî ne tenê bi dijwarkirina êrîşên ên li derdora bajêr ve sînordar e, lê di heman demê de birîna rêyên dabînkirina pêdiviyên jiyanê, astengkirina bazirganî, tevgerê û hedefgirtina binesaziya girîng jî digire nav xwe, ev yek rasterast bandor li jiyana rojane ya niştecihan dike û dibe sedemên metirsiya qeyranên mirovî. Ev dorpêçkirin di nav şert û mercên mirovî yên pir dijwar de, ku tê de gefên ewlehiyê bi rastiyek jiyanê ya bêhnteng ve girêdayî ne, ketiye roja xwe ya şeşemîn. Bajarê Koban bi rewşek mirovî ya karîset re rû bi rû ye, ji ber dijwarbûna êrîşan û dorpêçkirina tevahî ya li ser bajar û derdora wê, ku bûye sedema nebûna hema bêje tevahî pêdiviyên bingehîn ên jiyanê.

Di heman demê de, gundên derdora bajarê Kobanê rastî pêlên bilez ên koçberiyê ber bi navenda bajêr ve tên, ji ber topbaran û operasyonên dijminane li gundan direvin. Di rojên dawî de, bi dehan malbat ji gundên Başûrê Kobanê û gundewarên nêzîk koçber bûne piştî ku deverên wan bi çekên giran û topan hatine hedefgirtin.

### Hişyariya xeteriyê

Ji ber dorpêçkirina ji aliyê çeteyên Hikûmeta Demkî ya Sûriyê ve hatiya ferzkirin, şêniyên Kobanê di şert û mercên mirovî yên pir dijwar de jiyan dikin. Nebûna pêdiviyên bingehîn yên jiyanê ji bona welatiyên kobanê Bobelateke mirovî ye, weke nebûna av û elektrîkê û xwarin bi tenê bi tiştên ku ji dikanên bajêr peyda dibin ve sînordar dimîne. Heman tişt ji bo dermanan jî derbas dibe, tenê tiştên ku di dermanxaneyan de peyda dibin. Zengilê înzara xetera mirovî li Kobanê lêdide, ku heta roja îro, tu rêxistinên mafên mirovan, ji bo bangkirina dengê mirovahiyê li Kobaniyê tevger nekirine, ne civaka navneteweyî, ne jî welatên ku îdîa dikin demokratîk in, hemû li Kobaniyê li dijî mirovahiyê hêzên xwe kirine yek.

Di 23'ê Çile de pênc zarok li Kobaniyê ji ber sermaya zêde ya piştî bahoza berfê ya ku li herêmê xistiye jiyana xwe ji dest dan, ku ev nîşanek eşkere ya rewşa mirovî ya nebaş e. Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku hemû rêyên ku diçin Kobaniyê girtî ne, piştrast kir ku elektrîk, av û xizmetên înternetê qut bûne û hişyarî da ku rewşa mirovî ya li bajêr bêyî destwerdanek bibandor bi lez xirab dibe.

### Berxwedana berdewam

Tevî hemû karesatên mirovî û rewşa xeternak a heyî, gelê Kobanê bi hêzên xwe yên leşkerî û ewlehiyê û di bin pêşengiya şervanên jin ên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) de, careke din rêya berxwedanê li dijî hemû polîtîka û komployên li dijî wan hatine plankirin hilbijartin. Ji bo wan, ev şer şerê man û nemanê ye û ji bo pejirandina nasnameya wan e. Bi vê berxwedanê, ew ji bo Kobaniyê û ji bo tevahiya Rojava banga seferberiyeke giştî dikin û bang li Kurdên li hemû beşên Kurdistan û cîhanê dikin ku tevlî berxwedana gel bibin û li dijî hewldanên qirkirinê piştgiriyê bidin.

Di navbera dorpêça duh û îro de, Kobanê bajarekî wisa ye ku bi sebir li hember tecrîdê li ber xwe dide û bi hevgirtinê li hember xeteriyê radiweste, li benda pêşketinek siyasî an jî mirovî ye ku dawî li êşa niştecihên wê bîne û rê li ber dubarebûna beşek nû ya trajediya mirovî bigire ku hîn jî li ber çavan e. Berxwedana Kurdan di dîrokê de kûr e, ku bi salan e, Kurd rastî îxanetê hatine, lê ew bi nasname, hebûn û yekîtiya xwe berxwedaniyê dikin.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Nemerdî nekir:**
- Camêrî kir.

**Ser xwe re ye:**
- Pir hêja ye; camêr e.

**Serê xwe xist ber xwe:**
- Camêrî nekir; nemerdî kir.

**Siya wî heye:**
- Nander e; merd e.

**Xwe kêm nekir:**
- Camêrî kir; nexwest ji yên din kêmtir bide, yan bike.

**Xwe kêm nake/xwe kêmî hevalê xwe nake:**
- Camêr e; merd e; çikûziyê nake.

**Yek dîn yek dirist:**
- Ew nebaşiyê dike tu weke wî neke; tu camêriyê bike.

**LI SER RADESTBÛNÊ**

**Çekê xwe danî:**
- Dev ji têkoşîna xwe berda; dev ji rikberiya xwe berda.

**Destê xwe li ber danî:**
- Dev ji berxwedanê berda; radest bû.

**Destê xwe jê re danî:**
- Bi heman wateyê.

**Ji ber danî:**
- Teslîm bû; êdî dengê xwe nekir; stûyê xwe jê re xwar kir.

**LI SER MÊRXASIYÊ**

**Çeka wî li erdê nema:**
- Cihê wî hat dagirtin.

**Çêlîkên şêran jî şêr in:**
- Dema zarokên kesekî zana jêhatî bin hingê tê gotin.

**Du mûyên Melkemot di navbera her du birhên wî de bûn:**
- Pir biheybet bû; mirov jê ditirsiya; mêrxas bû; ji tiştekî neditirsiya.

**Îro roja mêran e:**
- Îro roja desthilanînê ye; îro roja kedê ye.

**Li pêş û paş nanêre:**
Leheng e, mêrxas e.

**Li pêşiya xwe nanêre:**
- Bi heman wateyê.

**Pozberan e:**
- Di şer de jêhatî ye; bavegîd e; palewan e; mêr e; mêrxas e.

**Ti kes nagihe toza wî:**
- Mêrxas e; palewena e.

**Ti kes nikare di siya wî dayne:**
- Bi heman wateyê.

**Xwîna wî di kefa destê wî de ye:**
- Ji mirinê natirse; leheng e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman




## Dayikên Aştiyê; Rojava bingeha avakirina demokrasî û azadiyê ye




Dayikên Aştiyê yên Bakurê Kurdistanê diyar kirin ku Rojava xeta wan a sor e û wiha gotin: "Em neheqiya li ser gelê me yê Rojava qebûl nakin û ger ji destê me were em ê çeka xwe rakin û berê xwe bidin Rojava û em naletê li Hakan Fîdan û bazarên wan yên qirêj tînin."**R-2**

## Lêkolînerê Misrî di Karûbarên Terorê de: HTŞ'ê DAIŞ'ê hembêz dike



Lêkolînerê di Karûbarên Terorê de Munîr Edîb da zanîn ku hêza bi fedekarî DAIŞ şikand QSD'ê bû û got, "Tenê QSD'ê dikare şerê li dijî DAIŞ'ê bide meşandin û parastina zindanên DAIŞ'ê û kampên malbatên çeteyan bike. Herwiha îro em dibînin ku desthilata nû ya Sûriyê di berdewamiya şerê li dijî QSD'ê de çeteyên DAIŞ'ê hembêz dike."**R-6**



## Kurdan bi berxwedaniya xwe destanên lehengiyê nivîsandin (3)

Şêxmeqsûd û Eşrefiyê keleha berxwedanê û cihê fedayiyan e. Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi berxwedaniya xwe dengê gelê Kurd kirin yek û mohra qehremaniya Kurdan li dîrokê dan.**R-7**



## Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Hunermend Vejîna Kurda yek ji wan dengên jin ên ku ezmanê edebiyata Kurdî ya hevdem ronî dike, helbestvaneke ku ne bi sirgûnê vemiriye, ne jî bi birînan westiyaye, lê wê ji êşên xwe pir avakirin ber bi bedewiyê ve û ji helbestên xwe sirûdên evîna ax, nasname û azadiyê afirandin.**R-9**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1346 28-Çile-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# YEKÎTIYA GELÊ KURD HESABÊ DAGIRKERAN TÊKBIR

Rêveberê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê diyar kir ku tu cudahî di navbera êrişên DAIŞ'ê û êrişên hikumeta demkî ku îro li ser Rojava tên meşandin tune ye, dixwazin projeyên xwe bi qirkirina gelê Kurd pêkbînin, lê yekîtiya gelê Kurd hesabên wan têkbir. Pêwîst e gelê Kurd li her derê tevlî seferberiyê bibe û berê xwe bide Rojava, ji ber Rojava xeta parastina Kurdistan û rûmeta gelê Kurd e.**R-4**



## 'Ji bo jiyaneke azad pêwîst e berxwedanî were kirin'



Dayikên bajarê Hesekê diyar kirin ku baweriya wan bi hêz û gelê wan heye, li hemberî êrişên qirkirinê yên dagirkeriya Tirk û çeteyên HTŞ`ê wê serî netewînin û wiha gotin, "Ji bo jiyaneke azad pêwîst e berxwedanî were kirin."**R-3**



**Nexşeya Netanyahu ya Reş**
Farûk Sakik R-4



**Dorpêçkirina Rojava û Hesabpirsîna Dîrokî yê Gelê Kurd**
E.Pêjder Altan R-5



**Di civakê de pirsgirêka zayendperestiyê**
Ehmed Hesen R-7



**Li Rojava berxwedan jiyan e**
Gulîstan Xalid R-10

# Ji bo parastina destkeftiyên Şoreşa Rojava jin li qadan e

Şoreşa Rojava bi pêşengtiya jinê dest pê kir, seferberiya ku hatiye îlankirin jî bi beşdarî û pêşengtiya jinê geş dibe. Herwiha Hevseroka PYD'ê Perwîn Yûsif ev anî ziman: "Jinan pêşengtiya Şoreşa Rojava kir niha jî dîlana azadiyê li dar e û em hemû tevlî vê dîlanê dibin."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Şoreşa Rojava bû şoreşa jinê û bi pêşengtiya jinê bû, dîrok dîsa xwe dubare dike di vê şerê ku li Rojava tê jiyan kirin de tevahî jin ji 7 salî haya 70'ê salî ji bo parastina destkeftiyên Şoreşa Rojava di nava seferberiyê de ne. Wê dîsa careke din di pelên dîrokê de were nivîsandin ku ev berxwedaniya li Rojava wê bi Şoreşa Rojava a duyemîn ku bi pêşengtî û keziya jin biserbikeve.



### Zihniyeta hikumete demkî û zihniyeta DAIŞ'ê yeke

Çeteyên hikumeta demkî ya girêdayî dewleta Tirk hovîtî, dijminatiya wê ji gelê Kurda re û neqebûlkirina vîna jinên azad di 6'ê Çile de li taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya Helebê xuya kir. Bi awayekî hovane êrişê sivîlan kirin, herwiha hertim vîn û hêza jinê armanc digirtin. Zihniyeta ku hikumeta demkî dimeşîne ji zihniyeta DAIŞ'ê ne cûda ye. Ji ber êrişên zêde û dijmirovî li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Meclîsa giştî ya taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê seferberî îlankirin. Tevahî gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji bo parastina taxa xwe ketin nava seferberiyê. Di nava vê seferberiyê de jin, jinên ciwan û jinên bi temen mezin li kêleka hêza xwe sekinîn û tevlî seferberiyê bûn. Jin di kîjan qadê de be bila bibe wê hertim pêşengtiyê bike.

### Dewleta tirk yekser şerê li ser Rojava dide meşandin

Piştî şerê li Şêxmeqsûd û Eşrfiyê çeteyên hikumeta demkî ya girêdayî dewleta Tirk a dagirker berê xwe dan herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û dest bi êrişan kirin û xwastin aramiya herêmê têk bibin. Bi alîkarî û pilanekî navnetewî êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Di van erîşan de ne tenê hikûmeta demikî cihê xwe digirt, lê belê dewleta Tirk û hêzên navnetewî jî hebûn. Di vî şerî de îxanet ji aliyê hin êlên Ereban ve jî hate kirin, zindanên DAIŞ'yan ên ku bi salaye QSD'ê parastina wan dike hatin vekirin û şaneyên razayî jî ketin nava tiv û tevgerê. Di vê derê de rewşa herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kete nava xeteriyeke mezin.

### Rêveberiya Xweser banga seferberiyê kir

Rêveberiya Xweser a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di 18'ê Çile de li dijî êrişên çeteyên hikumeta demkî ya Sûriyê yên girêdayî dewleta Tirk a dagirker û şaneyên DAIŞ'ê yên li ser herêmê seferberî îlankirin. Tevahî gelê Kurd li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji 7 salî heya 70'ê salî ji bo parastina axa xwe û destkeftiyên Şoreşa Rojava ketin nava tevgerê û seferberî îlankirin. Herwiha çawa ku Şoreşa Rojava bi pêşengtiya jinê dest pê kir, seferberiya ku hatiye îlankirin bi beşdarî û pêşengtiya jinê dest pê kir.

### Şoreşa Rojava bi jinê destpêkir û wê serkeftin jî bi pêşengtiya jinê pêkwere

Ji destpêka banga Rêveberiya Xweser ji bo seferberiyê tevahî jinên Kurd yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ketin nava tevgerê, bi daxuyanî û çalakiyan jinên berxwedêr tevlîbûna xwe ji seferberiyê re îlankirin. Çawa ku şoreşa Rojava bû şoreşa jinê û bi pêşengtiya jinê dest pê ki seferberî jî wê bi pêşengtî û israra jinê bi ser bikeve. Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemû jinên ku tevlî seferberiyê bûn çek rakirin û gotin ji bo parastina welatê xwe em hertim amadene û emê şer bikin. Jinên ciwan heya jinên bi temen mezin ji bo parastina axa xwe û peydakirina ewlehiyê bi şev û roj di nava kolanan de ne û parastina axa xwe dikin.

### Çar parçeyên Kurdistanê û dewletên Ewropî ketin nava seferberiyê

Herwiha ne tenê jinên Kurd yên li Rojava ketin tevgerê û seferberî îlankirin, di heman demê de jinên Bakurê Kurdistanê, Başûr, Rojhilat û Ewropa jî ketin nava tevgerê bi çalakî û meşên xwe ji bo piştgiriya Rojava seferberî îlankirin. Li seranserî cîhanî ji bo piştgiriya Rojava çalakiyên cûr be cûr tên lidarxistin û di nava van çalakiyan de jin roleke sereke û mezin dilîzin. Di vê çarçoveyê de Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Perwîn Yûsif ji Rojnameya me re axivî.

### 'Dîlana azadiyê li dare û em hemû tevlî vê dîlanê dibin'

Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Perwîn Yûsif diyar kir ku ev seferberiya hatiye îlankirin ji bo em bikaribin destkeftiyên Şoreşa Rojava biparêzin, û nehêlin dagirker derbasê axa me bibin û wiha got: "Armanca dijmin ew e, ku li ser gelê Kurd komkujiyan pêkbîne û destkeftiyên wî ji holê rake. Hişmendiya wan hişmendiya desthilatdare, ji bo vê jî ev şoreşa ku 14 sal in ku me destpêkiriye bi keda jinê bûye qada jina azad, lê niha ev şoreş di nava xeteriyeke mezin de ye, dema ku em dibêjin seferberî divê herkes li vîn, hebûn û îradeya xwe xwedî derkeve. Dîsa jî çawa ku jinê pêşengtiya Şoreşa Rojava kir, wê pêşengtiya vê seferberiyê jî bike. ji ber ku jin wê xwedî li nirxên şoreşê, ked, berdêlê bi hezarên şehîdê jin kirine oxira vê şoreşê derbikeve û em soza vê yekê didin û dem demeke dîrokî ye, dîsa jî di pelê dîroka gelê Kurd de wê ev destana berxwedaniyê were nivîsandin. Bi vê baweriyê em hemû jinên Rojavayê Kurdistanê ku ji kêliya destpêkê ve tevlî vê seferberiyê bûne silav dikin û wê têkoşîna me berdewam bike, dîlana azadiyê li dar e, û geleke em hemû tevlî vê dîlanê bibin."

# Dayikên Aştiyê; Rojava bingeha avakirina demokrasî û azadiyê ye

**Esma Mistefa**

**Dayikên Aştiyê yên Bakurê Kurdistanê diyar kirin ku Rojava xeta wan a sor e û wiha gotin: "Em neheqiya li ser gelê me yê Rojava qebûl nakin û ger ji destê me were em ê çeka xwe rakin û berê xwe bidin Rojava û em naletê li Hakan Fîdan û bazarên wan yên qirêj tînin."**

Ji bo piştgiriya Rojava li seranserî cîhanî gelê Kurd û yên welatparêz daketin qadan û bi yek dengî piştgiriya xwe ji gelê herêmê û şermezarkirina êrişên ku li ser destkeftiyên Şoreşa Rojava ya 14 salan hate kirin. Ev yek bi hemawextî destpêkirina êrişên li ser her du taxên Kurdan yên Helebê di 6'ê heyvê re dest pê kir.

Li Bakurê Kurdistanê gelek çalakiyên girseyî ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin kirin û bi hezaran li hemû bajar û navçeyan gel rabû ser piyan. Ev yek jî yekgirtin û yekhelwesta gelê Kurd derxist holê. Li ser vî bingehî Dayikên Aştiyê yên Bakurê Kurdistanê jî dengê xwe di vê serhildana gel de bilind kirin û daketin meydanan. Derbarê helwest û piştgiriya Dayikên Aşyiyê li Bakurê Kurdistanê ji bo Rojavayê Kudistanê şermezarkirina êrişên ku tên kirin dayika Efîfe Qartal û yadê Qudret Elyilmaz ji Rojnameya me re axivîn.

### 'Em ji bo Rojava li ser piyan e'

Yadê Efîfe wiha dest bi axaftina xwe kir: "Em silavên xwe ji vir heyanî axa Rojava rêdikin û em bi dil û can bi berxwedaniya gelê me yên li wir re ne. Berxwedana ku îro li wê derê tê raberkirin, berxwedanekî pîroz e ku bi sala ye li Rojava di oxira serkeftinê de, bedelên giran dide. Her çiqas ev komên xayîn û çete hewil bidin axa Rojava dagirbikin, lê wê nikaribin ji ber ku di wir de bi hezran şervanên me hene, xwîna pîroz hatiye dayîn, Rojava ne tenê ji gelê Rojava, ji bo hemû gelê Kurdistanê têkoşîn kiriye û dike.

Em li Bakurê Kurdistanê dilê me bi ser gel û şervanên me yên li Rojava ye. Em ji bo ku piştgiriya xwe raber bikin û dengê xwe bi wan re bikin yek, her çi ji me bê xwestin em ê bikin. Ji ber wê yekê gelek çalakiyên me li vir hatin çêkirin û em zêdeyî 300 û pêncî dayikan çûn Enqereyê û me muxatebê Hakan Fîdan kir û me got ka derkeve, du gotinên me hene em dixwazin ji te re bêjin. Ji ber wê yekê niha jî çalakiyên me ji bo gel û perçeya ji dilê me Rojava berdewam dikin. Em dengê xwe bi denê gelê me yê wir re dikin yek û wê tu carî dijminê gelê Kurd bi ser nekeve."

### 'Dewleta Tirk di nava xwîna Kurdan de fetisî ye'

Yadê Efîfe di berdewamiya axaftina xwe de da zanîn ku hovîtiya wan çeteyan bê sînor e û wiha got: "Komên çeteyan bê dil û wîjdan nêzî gelê Kurd dibin, hovîtiya wan çeteyan bê sînor e. Me dît ku çawa di Helebê de di taxên Eşrefiyê û Şêxmeqsûd de termê şervana me ya pîroz ji jor de avêtin erdê. Ev bê exlagî û bê rêzjiya mejî û dilê wan yê li hember jin û gelê Kurd dide nîşandan. Em wan çeteyan hezar carî lanet dikin. Dewleta Tirk jî yek ser destê wê di van sûc û kiryarên ku li Rojava tên kirin de heye, dewleta Tirkiyê di nava xwîna Kurdan de fetisî ye."

Yadê Efîfe bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Heyanî ji destê me tê em ê gelê xwe yê Rojava biparêzin; îro roj roja serhildan û berxwedanê ye, ne roja ku em xwe bixin hundiran û bitirsin. Xwîna hemû şervanên me li ku dibin bila bibin, xwîna zarokên me ne. Em bi piştgiriya xwe divê xwedî li wê berxwedaniyê derkevin. Ger ji destê me bê em ê çeka xwe rakin û bên bi gelê xwe yê Rojava re tevlî berxwedanê bibin."



Efîfe Qartal



Qudret Eryilmaz

### 'Rojava bingeha avakirina demukrasî û azadiyê ye'

Herwiha yadê Qudret derbarê piştgiriya berxwedana Rojava de wiha bilêv kir: "Li ser ew axa pîroz a ku bi xwîna zarokên me hatiya avdan, têkoşîna ji bo hemû perçeyên Kurdistanê tê kirin. Ev têkoşîna 14 salan ne tenê ji bo Rojava ye di heman demê de ji bo hemû Kurdistanê ye. Rojava bingeha avakirina Kurdistaneke serbixwe, bi ked û vîna Şehîdan daniye. Ji ber vê yekê em ê heyanî dawiyê û çi ji destê me were ji bo parastin û piştgiriya wê axa pîroz, wan şervanên YPJ û QSD'ê bikin."

Yadê Qudret bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Em bi hêviya aştiyê kar û têkoşîn dikin, lê belê dema ku kesek aştiyê fam neke weke van komên çete û dijminê gelê Kurd, wê demê şervanên me jî mecbûr in ku bi çek parastina xwe bikin. Ji ber wê şerê ku niha li ser xaka Rojava tê kirin şerekî bê heq û ne rewa ye, gelê wê derê li ser axa xwe jiyan dikin, ev yek mafê me ye, ji hezaran salan ve ev ax ya Kurd û Kurdistanê ye tu mafê kesî nîne ku dest bavêje axa me."



# Kesayetên naskirî yên cîhanî nerazîbûn nîşanî êrişên li ser Rojava dan

Raya giştî ya demokratîk li Ewropayê li dijî êrişên hikumeta demkî ku bi koordînasyona dewleta Tirk tevdigere li dijî gelê Kurd, nerazîbûn nîşan da û bang li Yekîtiya Ewropayê kirin ku helwesteke zelal raber bikin.

**Navenda Nûçeyan**

Li herêma Rojavayê Kurdistanê ji 6'ê çile de, çekdarên girêdayî hikumeta demikî ya Şamê bi piştgirya dewleta Tirk a dagireker êrişên xwe li ser hêzên kurdî kiriye, bi armanca ku detshilata xwe bi giştî li ser xakê bike, bêyî ku kurd dîsa mafên xwe bidest bixin di heman demê de qirkirina entîkî li dijî gelê Kurd pêk bîne.

Li ser seranserî Kurdistanê seferberiya giştî hate raghandin êdî ji her sê parçeyên din yên Kurdistanê gelek ciwan tevlî berxwdana parastina Rojava bûn, her wiha li ser asta cîhanî xwepêşandan û protestoyên civaka kurd û dostên wan hatin li dar xistin û hîn jî berdewam dike.

Ev protesto û xwepêşandan bandoreke baş li ser cîhanê kir, êdî her kes niha dizane ku Kurd li hember gefa qikirina entîkê lê tê kirin, lewma gelek siyasetmeda, çalakvan û hiqûqnasên li seranserî cîhanê nerazîbûnê xwe li hermberî van êrişan nîşan dan û piştgiriya xwe raghandin. Siyasetmedarên Ewropayê ku banga hevgirtinê bi Rojava re kirin, nêrînên xwe wiha anîn ziman.

### Martin Schirdewan: Pereyên gelên Ewropayê şerê li dijî kurdan fînanse dike

Martin Schirdewan, MEP, li Parlamenta Ewropayê Hevserokê Koma Çep e (The Left) û DIE LINKE Elmanya Schirdewan, got ku nayê qebûlkirin ku rayedarên YE'yê fonên giştî yên Ewropayê ji bo hikûmeta veguhêz a ku li dijî Kurdan şer dike raber bike û daxwaza rawestandina tavilê ya şer kir û banga hevgirtina bi Rojava re kir.

### Andreas Schieder: Em bi tundî rola Tirkiyê rexne dikin

Andreas Schieder, Parlamenterê PE, Îtîfaqa Pêşverû ya Sosyalîst û Demokratan (S&D), SPO Awusturya. Schieder, bal kişand ser zêdebûna tundî û êrişên li dijî Kurdan û diyar kir ku hikûmeta veguhêz a Sûriyê li şûna lihevhatinê, zext hilbijartiye û bi tundî rexne li rola Tirkiyê kir.

### Jonas Sjosedt: Bêdengî ne bêalîbûne hevkariya sûc e




Jonas Sjostedt, Parlamenterê PE, Koma Çep a Parlamenta Ewropayê - GUE/NGL, Vänsterpartiet Swêdê. Jonas Sjostedt got, "Rewşa dawî ya li Sûriyê fikarên mezin çêdikin. Hikûmeta Îslamî li dijî Kurdan şer dike. Kurdan neçar dikin mîna her carê parastina xwe bikin."

Sjostedt, bi bîr xist ku Kurd di şerê li dijî DAÎŞ'ê û El Qaîdeyê de pêşengî kirine û got, "Di vê rewşê de, divê civaka navneteweyî bi awayekî zelal diyar bike ku binpêkirinên mafên kêmneteweyan qet nayên qebûlkirin. Mafê Elewî, Durzî, Xiristiyan û Kurdan heye ku li Heleb, Rojava û li seranserê Sûriyê bi azadî û bi rûmet bijîn.

### Evîn Incir: Nabe ku YE'yê li ber vê komkujiyê bêdeng bimîne

Evîn Incir, Parlamentera PE, Tîfaqa Pêşverû ya Sosyalîst û Demokratan (S&D), Partiya Sosyal Demokrat a Swêdê, Evîn Incir, diyar kir ku çeteyên ji hêla Tirkiyê ve têne destekirin li dijî Kurdan sûcên şer dikin û got ku dayîna piştgiriya darayî ya bê şert û merc a YE'yê ji bo Şamê rewşek xeternak e û got divê gavên bilez ji bo agirbestê werin avêtin.

### Brnando Benifei: Kurd ji bo hevsengiya hêzê tên qurbandkirin

Brando Benifei, Parlamenterê PE, Îtîfaqa Pêşverû ya Sosyalîst û Demokratan (S&D), PD Îtalya: Benifei jî got, "Piştî êrişên li dijî Durzî û Elewiyan vê carê Kurd rastî êrişên giran tên. Ev yek nîşaneya wê yekê ye ku rêveçûna Sûriye ya piştî têkçûna Esad bi pêşengiya Ehmad El Şera û Tirkiyê çiqas xeternak bûye."

Benifei, destnîşan kir ku Kurd li dijî DAIŞ'ê hevalbendên welatên Rojava bûn, lê îro ji bo hevsengiyên nû yên herêmî tên qurbankirin.

### Ozlem Alev Demîrel: Destê xwe ji ser Rojava bişkînin

Ozlem Alev Demîrel, Parlamentera PE, Koma Çep a Parlamenta Ewropayê - GUE/NGL, DIE LINKE Elmanya, Ozlem Alev Demîrel jî wiha got, "Divê civaka navneteweyî niha bikeve nava liv û tevgerê. Divê hikûmeta El-Şera heta maf û ewlehiya Kurd, Elewî, Durzî û yên din misoger neke neyê fînansekirin. Sûriyê dewletek pir-etnîkî ye. Kurdên ku li dijî DAIŞ'ê şer kirin û ji bo Sûriyeyek yekgirtî ya li ser bingeha xwerêveberiyê parêzvanî kirin, heq dikin ku mafên wekhev, nasname û parastinê bidest bixin."

### Per Clausen: Ev dişbihe hewldanên paqijkirina entîkî

Per Clausen, Parlamenterê PE, Koma Çep a Parlamenta Ewropayê - GUE/NGL, Enhedslisten Danîmark, Per Clausen jî wiha got, "Pir giring e ku civaka navneteweyî - tevî Yekîtiya Ewropayê - bi awayekî zelal diyar bike ku binpêkirinên mafên kêmneteweyan nayên qebûlkirin. Çi Elewî, çi Durzî, çi Xiristiyan, çi Kurd, çi jî her kêmneteweyek din, mafê wan heye ku li seranserê Sûriyeyê bi azadî û bi rûmet bijîn.

### Hevserokên Die Linke: Rojava ronahiya hêviyê ye, hewl tê dayîn bê tinekirin

Hevserokên Die Linke (Partiya Çep) Ines Schwerdtner û Jan van Aken û Berdevka Polîtîkaya Derve Cansu Ozdemîr li Berlîn, Elmanya, Hevserokên Die Linke diyar kirin ku Rojava ji her demê bêhtir di bin gefê de ye û got ku sîstema azadîxwaz û pir-etnîkî ya Rojava tê hedefgirtin.

Hevserokan gotin, "Em bang li Hikûmeta Federal dikin ku êrişên Tirkiyê û Sûriyê yên li ser herêma Rojava bi tundî şermezar bike. Divê serdana fermî ya El-Şera ya Elmanya bi fermî were betalkirin. Di bin van şert û mercan de, normalîzekirina têkiliyên di navbera Elmanya û Sûriyê de çênabe. Her wiha em daxwaz dikin ku NY civînek taybet li ser rewşa Sûriyê li dar bixe."

### Panot: Divê Rojava bê parastin

Seroka Koma La France Insoumise ya li Parlementê Mathilde Panot, diyar kir ku Fransa nikare li hember êrişên Îslamîst ên ku ji hêla Tirkiyê ve têne destekirin bêdeng bimîne û banga parastina çalak a modela Rojava kir.

### Petre Bayr: Heta aktorên kurd neyên tevlî kirin aramî çênabe

Petra Bayr endama Encumena Neteweyî ya Awusturya û berdevka SPO'yê ji bo siyaseta derve û geşedana cîhanî. Petra Beyr got, "Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Kurd bi zordarî, pevçûn û koçberiyeke dijwar re rû bi rû ne. Hikûmeta Veguhêz a Sûriyê ku ji hêla Tirkiyê ve tê rêvebirin, rêveberiya xweser a demokratîk li Rojava hedef digire. Li dijî vê civaka navneteweyî bi piranî bêdeng dimîne. Bêyî tevlîbûna Kurdan di pêvajoyê de û bêyî parastina mafên sivîl û kêmneteweyan, aramiya mayînde li Sûriyê û herêmê ne mumkin e; avahiya demokratîk a pir-etnîkî li Rojava divê ji bo berjewendiyên jeopolîtîk neyê qurbanîkirin."

Fabian Molina: Hevkarî berpirsyariyeke siyasî ye

Parlamenterê Partiya Sosyal Demokrat a Swîsreyê Fabian Molina, da zanîn ku hevgirtina bi gelê Kurd û hemû kêmneteweyan re berpirsiyariyek siyasî ye û bang kir ku li dijî binpêkirinên qanûnên navneteweyî gavên berbiçav werin avêtin.

50 kesayetên Kurd û Alman daxwaza rawestandina êrişan kirin

Di heman demê de nêzîkî 50 kesayetên naskirî yên Kurd û Alman, bi rêya rêxistina Hawar.helpê nameyeke vekirî ji siyasetmedarên Alman û Yekîtiya Ewropayê re şand û daxwaza pêngavên bilez ên ji bo rawestandina êrişên li Rojavayê Kurdistanê kir.

Name ji aliyê gelek rêxistinan ve, di nav de "Civaka Kurd a Almanyayê" û kesayetên navdar ên wekî futbolîst Deniz Undav, lîstikvan Natalia Worner, rapbêj Haftbefehl û KC Rebell, siyasetmedar Bêrîvan Aymaz, rojnameger Duzen Tekkal, lîstikvan Jasmin Tabatabai, Prof. Jan Îlhan Kizilhan, derhêner Soleen Yusef, nivîskar Stefanie Sargnagel û gelek kesayetên din ve hatiye îmzekirin.

### Rewşa mirovî û leşkerî metirsîdar e

Li gorî naveroka nameyê ku medyayê navdar a Almanyayê "ZDF"yê jî belav kiriye, rewşa mirovî û leşkerî ya li herêmê bi awayekî metirsîdar xirabûye.

Di nameyê de hat diyarkirin ku "Hikûmeta Demkî ya Sûriyê, komên çekdar ên Îslamî yên hevpeymanên wê û hêzên nêzîkî Tirkiyê" êrişên dijwar dibin ser deverên di bin kontrola Rêveberiya Xweser de.

### Hişyariya "tawanên dijî mirovahiyê"

Di nameyê de hişyarî hat dayîn ku ji ber van êrişan tawanên li dijî mirovahiyê hatine kirin û bûye sedema koçberiya girseyî.

Her wiha hat destnîşankirin ku êriş li ser stasyonên elektrîkê û nexweşxaneyan hatine kirin û vê yekê metirsiya serhildana DAIŞ'ê zêde kiriye.

### Daxwazên sereke

-Divê gavên dîplomatîk û siyasî yên bilez ji bo parastina sivîlan bên avêtin û zext li Şam û Tirkiyê were kirin da ku şer rawestînin.

-Divê ji bo rêlibergirtina serhildana DAIŞ'ê bi Koalîsyona Navneteweyî re hevahengî were kirin û bi Rêveberiya Xweser re diyalog were destpêkirin.

-Divê xebat bên kirin da ku tîma lêkolînê ya Neteweyên Yekbûyî were şandin û alîkariyên darayî yên Yekîtiya Ewropayê yên ji bo Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê bên rawestandin.

-Divê serdana Ehmed Şer a ji bo Almanyayê were betalkirin û Balyozê Tirkiyê ji bo Wezareta Karên Derve were gazîkirin.

# ‘Wêrankirina goristanên Şehîdan kiryareke dijmirovî ye’

Endamên Meclisa Malbatên Şehîdan a kantona Cizîrê dan diyarkirin ku komên çeteyan û dewleta Tirk bi dagirkirina her herêmekê re goristanên şehîdan wêran dikin û gotin, “Wêrankirina goristanên şehîdan kiryareke dijmirovî ye."

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker, çeteyên girêdayî wê û çeteyên hikumeta demikî ya Sûriyê dema ku her herêmekê dagir dikin yekser berê xwe didin goristanê şehîdan û wêran dikin. Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve û heta niha kiryarên çeteyan û bêhurmetiya wan li dijî goristanên şehîdan û cihên pîroz dewam dikin û bi dehan goristan li ser destê van çeteyên hov hatine wêrankirin.
Di derbarê mijarê de rêveberên Meclisa Malbatên Şehîdan a kantona Cizîrê Masûm Hesen û Armanc Mihemed ji Rojnameya me re axivîn.


Mehsûm Hesen


Armanc Mihemed

**‘Kiryarên çeteyan derveyî exlaq û pîvanên mirovahiyê ne’**

Mehsûm diyar kir ku kiryarên çeteyan derveyî exlaq û pîvanên mirovahiyê ne û wiha got: “Ev çeteyên ku roj bi roj şerê me dikin kesine derveyî exlaq û pîvanên mirovahiyê ne. Di şer de pîvanên exlaqî hene, lê ev çeteyên ku şerê me dikin li dijî gelê Kurd kiryarên dijmirovî dikin. Herwiha hedef û armanca van çeteyan qirkirina gelê Kurd e. Ew heta bêhurmetiyê li dijî şehîdan jî dikin, heta ji goristanê şehîdan ditirsin. Çete dema cihekî Kurdan dagir dikin yekser berê xwe didin goristanê şehîdan û wan wêran dikin. Ji xwe ev yek li Efrîn, Şehba, Minbic, Serêkaniyê û Til Ebiyed û gelek deverên din li ber çavan hate kirin. Rastiya hovîtiya ku tê meşandin ji bo hemû gelên cîhanê işkere bû û rastiya van hêzên çete weke her car hate naskirin. Armanca çeteyên hov û dewleta tirk ew e ku li ser gelê kurd komkujiyan pêkbînin û vîna gelê kurd bişkînin.

**‘Pêwîste kes û aliyên kiryarên dijmirovî dane meşandin werin dadgehkirin’**

Mehsûm Hesen da zanîn ku pêwîst e çete û aliyên ku piştgirî dan wan bên cezakirin. Herwiha îro Rojava şensekî mezine ji bona me û eger di Rojava de em li ber xwe nedin, wê xeterî li ser Bakur, Başûr û Rojhilat jî çêbibe. Ji xwe me dît di mînaka Şêxmeqsûd de ku çawa Kurdên herçar parçên Kurdistanê hemû bi yek dengî piştgiriya berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kirin. Ji ber vaqas tiştan jî gelê me heya dawiyê wê li ber xwe bide û wê xwedî li civaka xwe û şehîdên xwe jî derkevê.”

**Heyanî neha sazî û yekîtiya mafê mirovan tiştek ji bona gelê Kurd nekiriye**

Armanc Mihemed di destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser 10’ê Adarê û wiha got: “Ev êrîşên hovane yên ku li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên dûbarekirin û domandin armanca wan qirkirina gelê Kurde û tunekirina destkeftiyê gelê Kurd e. Li mehberî van êrîşên hovane yên ku li ser gelê Kurd têne kirin, em bang li cîhanê tevahî dikin ku ji bona parastina gelê kurd bikevin nava liv û tevgerê de û van êrîşên hovane yên ku têne meşandin rawestînin.
Ji bona vê yekê pêwîste ku cîhan tev bi erkê xwe rabe û li gel gelê kurd bisekne û destekê bide doz û vîna wî ya ji bona pêkanîna azadî û demukrasiyê.
Ji milekî komkujiyan li ser gel pêktînin û ji milekî din ve jî kesên ku şehîd dikevin jî ji hovîtiya wan xilas nabin, ji br ku ew êrîşî goristanan jî dikin.
Ji ber vê jî Xirakirina goristanên şehîdan bê pîvaniya exlaqî ye û çeteyên heyî tu par ji mirovahiyê negirtine û pêwîste ku di nava dadgehên navnetewî de ji ber van kiryaran werin dadgehkirin. Banga me jî wek Meclisa Malbatên Şehîdan ew e ku em xwedî li nirxê şehîdên xwe derkevin û destkeftiyên ku bi xwînê pêkhatine biparêzin.



## Li Rojava berxwedan jiyan e



**Gulîstan Xalid**

Ji xwe de şoreşger û qehremanên di dîrokê de ne gotine berxwedan jiyan e, û teslîmiyet îxanete, mirin e. Ev ne duruşmeyeke, ev felsefeya hebûn û tûnebûnê ye.
Di tevahiya dîrokê de ji bo gelan herdem ji aliyê desthilatdaran ve mecbûriyeta hilbijartina du rêk hatiye nîşandan, ya serî tewandin yan jî berxwedan. Ev weke bijarteke hatibe pêşkêşkirin jî; lê di rastiyê de ev cûdahiyeke di navbera jiyan û mirinê de ye. Ji ber berxwedayîn ne tenê rakirina çek an jî di kolanan de qîrkirin e. Berxwedanî hebûna xwe li hemberî înkarkirinê parastin e. Berxwedanî wêrekiya û di xwebûna xwe de israre.
Teslîmiyet pirî caran di bin navê ez jiyan bikim de tê kirin an jî dibe bazariyek ku li ser te tê ferzkirin. Lê teslîmiyet, devjberdana îrade, hafîze û pêşeroja xweye. Bedenên ku teslîm dibin dikare jiyan bikin, lê ruh ji zûve dimre. Ji ber teslîmiyet ne tenê roja îro ye, siberoja xwe jî ji dijmin re hiştine. Ji lewma teslîmiyet ji bo gelekî ne tenê binkeftine, di heman demê de îxaneta li hemberî nifşên nû yê wî gelîye ye.
Gelên ku li berxwe didin dizanin, jiyan tenê ji dan û standina nefesê îbaret nîne, jiyan bi rûmetê, bi nasnameyê û bi azadiyê ve wate qezenc dike. Ger ku zimanê gelekî hatibe qedexe kirin, axa wî hatibe dagirkirin, îradeya wî hatibe tune hesibandin, li wir nikare qala jiyaneke asayî bike. Aha di vê xalê de berxwedanî hilbijartekek nîne, mecbûriyet e. Gelê ku li ber xwe nede hêdî hêdî tê wenda kirin ku pir mînakên xelkên wendayî û aqûbeta wan ne diyarkirî jî hene.
Gelê ku li berxwe dide bedel dide, lê hebûna xwe jî diparêze. Berxwedanî gelek caran bi fedekarî, bi êş û wendahiyan re tê bibîrxistin. Lê ev êş, ji rizîbûna bê deng ya teslîmiyetê bi rûmettire. Berxwedanî, mîrasa herî bi nirx û bi hêz ya ku dayikek ji zarokê xwe re bihêle: Hafîzeyeke mayinde ku serî natewîne radighîne. Gelekî ku ji zarokên xwe re dersa herî bingehîn bide fêrkirin ewe ku: Azadî nayê xwestin, tê standin.
Cihê ku teslîmiyet lê hebe jixwe îxanet jî ji rêzê dibe. Ji ber yê ku teslîm dibin, dagirkerî û bindestiyê jî normal dikin, bi zilmê qayil dibin, neheqiyê jî ji bo xwe rewa û weke çarenûsê dibînin. Îja ev ne tenê li hemberî dijminê xwe, li hemberî gelê xwe jî fêrî îxanetê dibe. Lê berxwedanî li hemberî vê xiyanetê xeteke wijdaniye. Li hemberî kesên ku dibêjin her tiş xelas bûye, îradeya ku dibêje hîna em xelas nebûne dide nîşandan. Gelên ku îro li berxwe didin, ne tenê ji bo xwe, ji bo rûmeta mirovatiyê jî li berxwe didin. Ji ber ku berxwedaniya gelekî dema ku dişke, ew ne tenê erdîngariyeke, wijdanê hevbeş yê mirovatiyê jî birîndar dibe û dişke. Ji lewma berxwedanî gerdûniye. Halê herî zelal yê parazvanên jiyanê ne.
Di encam de: Berxwedan jiyan e, ji ber ku berxwedanî israra parastina hebûnê ye. Lê teslîmiyet ji mirinê jî xirabtire. Ji ber ku mirovan dizîvirîne mîna siyeke ku hebûn û tûnebûna wê weke hev dike. Gel ya wê jiyaneke bi rûmet hildibijêre, an jî tunebûneke bê deng. Dîrok yê ku li berxwedide dinivisîne, lê yê ku teslîm dibe bi rûreşî û lanetê mohir dike.
Vaye ya ku li Rojava tê jiyan kirin, têkoşîna gelê ku ji bo parastina hebûna xwe dibêje berxwedan jiyan e. Gelê ku azadî naskiriye wê tûcarî teslîmiyetê qebûl neke.

# Bi êrişan dixwazin Komploya Navneteweyî temam bikin

**Leyla Amûdê**

Careke din li ser gelê Kurd komkujî tê sepandin. Lê weke tê dîtin gelê me li çar parçeyên Kurdistanê xwedî li Rojava derdikeve, destûr nade careke din Kurd di nav lepên kujerên kastîk de bimînin û têk biçin. Ev xwedîderketin pir bi rûmet e û wateya wê jî avabûna vîna Kurdên azad û xwedî nasname ye. Gelê Kurd xwedî dîrokeke dirêj a serhildan û berxwedanê ye. Ew berxwedan ji bo me bûye çandeke resen. Her em ê li wê çanda berxwedanê xwedî derkevin û bibin serkeftinê. Dijminên me dirinde û hov in. Em ê heya dawiyê ji bo azadiya xwe têkoşîn bikin.
Em weke Kurd xwedî vîneke pir xurt in. Em ê her di serkeftinê de israr bikin. Heya em weke gelên cîhanê bigihîjin hedef û armanca xwe wê berxwedana me bidome. Kurd neteweyeke resen a ku rehên wê kûr û dîrokî ye. Gelên wir têk naçin, xwe ji xweliya xwe diafirînin û zindî dibin. Bila ew hêzên êrîşkar pir baş bizanin ku wê bi çend hezar çeteyan û êrîşên herî hovane nikaribin çavên gelê Kurd bitirsînin. Wê berxwedan û ezma me neşike û têkoşîna me jî serkeftî be. Ez careke din jî teqez dikim ku şervanên YPJ, YPG û QSD’ê di şerê rûmetê de xwedî azwerî û biryardariyeke pir mezin in. Baweriyê didin gelê xwe ku wê her hebin û wan biparêzin.
Hêzên navneteweyî û bi taybet hêzên NATO’yê li pişt van êrîşên dirinde ne. Li ser hêzên bi salan li hember çeteyên herî tundrew ên cîhanê şer kirine xweradestkirinê ferz dikin. Girtîgehên çeteyên herî barbar ên cîhanê têde ne radestî HTŞ’ya serokê wê jixwe berê DAIŞ’î bû dikin. Di nav van çend rojên dawî de me hemûyan dît ku çeteyên hikûmeta demkî ya Şamê destpêkê berê xwe dan wan girtîgehan û ew çete serbest berdan. Cilên nû dane wan da ku têkevin nava gel.
Niha jî pir baş rohnî dibe bê çawa dewletên sermayeparêz ketine pey parastina berjewendiyên xwe û hêzên Koalîsyonê dixwazin gelê Kurd bikin berxê qurbanê. Lê divê were zanîn Kurd wê careke din ji bo ti kesî nebin qurban. Eger îro li Rojavayê Kurditanê şer û êrîş li ser Kurdan heye, teqez ev tê wateya ku ne teslîmkarî, berevajî israra xwedîderketina li nirx û kerameta xwe heye. Ev jî cihê rûmet û serbilindiyê ye.
Teqez pêwîst e were zanîn ku hêzên navdewletî Komploya Navneteweyî ya li ser Rêber Apo berdewam dikin. Bi wan êrîşan jî dixwazin kompleyê temam bikin, tevahî nirx û destkeftiyên li ser esasê fikir û perspektîfên Rêbertî ava bûne ji holê rakin. Dixwazin ji me Kurdan re bêjin hûn divê her bindest û kole bin. Em dibêjin, “Me weke Kurd biryara jiyana azad û wekhev daye û em jê venagerin.”
Divê pir baş were zanîn ku Rêber Abdullah Ocalan ji zû ve Komploya Navneteweyî têk biriye û siyaseta wan dewletên dirinde jî vala derxistiye. Ji sedî sed wê careke din gelê Kurd van êrîşên bêrehm pûç bike û serkeftinê bi dest bixe. Jixwe li hemû parçeyên Kurdistanê xwedîderketina li Rojava nîşaneya vê yekê ye.
Wê ti carî vîna gelê Kurd neşike. Paradîgmaya Rêber Apo ya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê her biçe wê zêdetir pêş bikeve. Ne tenê gelê Kurd, wê hemû gel li ser esasê vê paradîgmayê ji bin hukmê desthilatdariyên zalim û zordest rizgar bibin.



# ‘Ji bo jiyaneke azad pêwîst e berxwedanî were kirin’

Dayikên bajarê Hesekê diyar kirin ku baweriya wan bi hêz û gelê wan heye, li hemberî êrişên qirkirinê yên dagirkeriya Tirk û çeteyên HTŞ`ê wê serî netewînin û wiha gotin, “Ji bo jiyaneke azad pêwîst e berxwedanî were kirin."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Parastina polîtîka, parastina civaka exlaqî û polîtîk e. Ya rast civakeke ku nikaribe xwe biparêze, wê wateya xwe exlaqî û polîtîk winda bike. Ew civak ya hatiya mêtandin an jî heliyaye û riziyaye; li hember vê yekê ya li ber xwe dide yan jî dixwaze nasnameya exlaqî û polîtîk ji nû ve bi dest bixe û xebatbarî bike. Parastin di navê vê pêvajoyê ye. Civakeke ku dixwaze di xwe de israr bike, her cure mêtandin û zextan red bike, encax vê yekê bi derfet û saziyên parastina cewherî pêk bîne. Wê van hêzan ji bo ku hebûna xwe biparên bi hemû hêza xwe li ber xwe bidin. Lewre, wê parastina cewherî wekî daxwazeke civakî demeke dirêj di rojeva civakê de ciyekî girîng bigire.
Niha jî li Rojavayê Kurdistanê ji dayik, bav, ixtiyar, ciwan û jin çek û rextên xwe rakirina li ser milan 24 satan de kolan û taxên xwe ji çeteyên DAIŞ û HTŞ`ê diparêzin. Gotin û soz dane ku wê nehêlin dijmin derbasî xaka wan bibe, her wiha bi gotina ax axa meye û parastin erka meya destpêkirine û heya roja îro berdewame. Di vê çarçoveyê de dayikên bajarê Hesekê ji Rojnameya me re axivin.


Mutîha Silo


Hediya Mihemed

**‘Wê berxwedan û tekoşîn dewam bike’**

Mutîha Silo di dasetpêka axaftina xwe de diyar kir ku pêwîste ew bi erka xwe ya parastinê pêk bînin û wiha got: “Bêguman xwe parastin ango parastina cewherî tenê bi hêzên fermî ên leşkerî jî nabe. Xwe parastin mijareke civakî ye û hev temam kirin pêwîst dike. Di dîroka civaka me de jî tê dîtin li hemberî hemû êrişên ku çêbûne civakê bi hêza xwe, xwe parastiye û li hemberî hemû êrişan parastina xwe ya cewherî esas girtiye. Li ser ragihandina seferberiya giştî, dayik, bav, keç û xotên me tevlî bûn. Her wiha bê navber niha parastina axa Rojava dikin. Heya ku yek ji me hebe wê berxwedan, tekoşîn û xwe parastin dewam bike, em ê erka xwe ya xwe parastinê bi cîh bînin.”
‘Ji bo jiyaneke azad divê berxwedan were kirin’
Mutîha Silo di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Me dît ku çawa dayîk, jin û zarokên me di şerê li hemberî DAIŞ`ê û êrişên Erdogan yên ser Rojava de di xeta pêşî de li rex şervanan şerê dijmin kir. Herwiha dayik jî erka wan ya serke ew bû ku bi tîmên tenduristiyê dixebitîn. Di heman demê de li xeta pêşî xwarina şervanan çêdikirin. Dayîk û Jinan di qada civakî û leşkerî de pêşengî ji şoreşê re kirin û bi vê pêşengiya xwe bi ser ketin. Li ser heman bingehî niha li hemberî gef û êrişên çeteyên DAIŞ û HTŞ`ê, dayîkan erkê xwe yê perwerdeya civakê û hişyarkirina wê, pêk anîn û bi rêxistin kirin. Hişmendiya parastina rewa li cem civakê çand ku tenê bi riya berxedanê emê bikarin êrişên dijmin têk bibin û ji bo jiyaneke azad divê berxwedan were kirin.”

**‘Baweriya me bi hêza û gelê me heye’**

Di heman çarçoveyê de Hediya Mihemed dstnîşan kir ku heye ew hene tu kes nikare îradeya wan têk bibe û wiha pê de çû: “parastina ji mafî her kesî ye, ji ber ku jiyan li ser esasê xwe parastin hatiye avakirin û meşandin. Mirovê parastina xwe, ax û civaka xwe neke, wê nikaribe li ser xaka xwe jî bijî. Edî ev dem jî ne dema berê ye, civakê xwe bi rêxistin kiriye. Me bi saya wê jî gelek destkeftî bi dest xistin û hêza QSD`ê û Asayişê ava kirine. Gel bi hezaran pakrewan di vê dozê de dane û bi sedhezaran qeherman di heman dozê de hê têdikoşin û gel bûye xwediyê vîneke mezin. Ji ber wê baweriya me bi hêza gelê me heye; li hemberî êrişên qirkirinê yên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê em ê ti carî hêza xwe nespêrin ne Amerîka û ne jî Rûsya. Ji xwe civaka me jî dizane ku ev hêz ji bo berjewendiyên xwe hatine.”

**‘Parastina xwe bikin bingeha serkeftinê’**

Hediya Mihemed teqez kir ku ew ti carî derfetê nedin ku xwefiroş û xayîn cihê xwe di vê xaka pîroz de bigirin û wiha got: “Banga min li tevahî gelê Rojavayê Kurdistanê û her çar parçayan heye ku parastina xwe bikin bingeha serkeftinê. Her wiha Rêber Apo dibêje ‘yê parastina xwe neke, mirin û tinekirina wî misoger e’. ji ber vê yekê em wek dayikên Hesekê heya dawiyê emê li ber xwe bidin û teqaz em ê serkeftinê mesoger bikin.”

# Çeteyên hikumeta demkî pabendî lihevkirin û agirbestan nabin

**Navenda Nûçeyan**

**Ji bo qirkirina gelê Kurd û têkbirina destkeftiyên Şoreşa Rojava, çeteyên hikumeta demkî ji 16’ê Çileyê ve êrişî Rojavayê Kurdistanê dikin. Tevî ragihandina agirbestan jî lê çete êrişên xwe berdewam dikin.**



Piştî êrişên çeteyan yên ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û dagirkirina her du taxan, di 14’ê Çile de çeteyan dest bi êrişên li ser bajarokê Dêrhafir û Meskenê yên girêdayî bajarê Tebqayê kirin, çeteyan bi awayekî hovane bisazî û malên welatiyan kirin armanc.
Ji bo rêgirtina li ber êrişên çeteyan û pevçûnan, di 16’ê Çileyê de şandeyek ji Koalîsyona Navneteweyî û fermandarên QSD’ê çûn bajarê Dêr Hafirê ya kantona Tebqayê û di navbera wan de civînek pêk hat û di encamê de QSD’ê biryar da ku xwe ji Dêrhafir û Meskenê vekişîne û hêzên xwe li Rojhilatê Firatê bicih bike.
Piştr Fermandarê giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mazlûm Ebdî diyar ki ku li ser bingeha bangên welatên dost û navbeynkaran, bi armanca nîşandana niyeta wan ya baş ji bo temamkirina pêvajoya entegrasyonê û pabendbûna wan ji bo bicihanîna şertên peymana 10’ê Adarê, wan biryar da ku hêzên xwedi 17 Çileyê saet 07:00’an sibehê ji herêmên niha yên bi ser rojhilatê Helebê ber bi herêmên rojhilatê Firatê ve vekişînin.
Piştre QSD’ê di çarçoveya pêkanîna biryarê de, dest bi vekişîna hêzên xwe ji herêma pevçûnan a rojhilatê Helebê li Dêrhafir û Meskenê kir.
Hatibû lihevkirin ku piştî vekişîna hêzên QSD’ê, hêzên çeteyên hikumeta demikî derbasî bajarên Dêr Hafir û Meskene yê rojhilatê Helebê bibin. Lê çeteyan bendên lihevkirinê binpê kirin û beriya temambûna vekişîna hêzên QSD’ê, derbasî her du bajaran bûn û êrişî xalên şervanên QSD’ê kirin, çeteyan xwest ku şervanên QSD’ê dorpêç bikin û di encamê de şer derket. Herwiha hin şervan hatin dorpêçkirin û şehîd û birîndar jî çêbûn.
Çeteyên hikumeta Şamê di 17’ê Çileyê de dest bi êrişek berfireh li ser Tebqa, Reqa, bendava Tişrîn, Dêrazorê û Başûrê Hesekê kir.

**Agirbesta 18 Çile**

Di 18’ê Çileyê de Wezareta Parastinê ya hikumeta demkî ya Sûriyeyê li tevanî eniyan agirbest ragihand. Ev agirbest, li ser bingeha rêkeftina di navbera hikumeta demkî û QSD’ê de hatiye îmzekirin, hat ragihandin. Lê çeteyan agirbest binpêkirin û êrişî girtîgeha Eqtan a li bajarê Reqayê kirin ku bi sedan DAIŞ’î tê de hebûn. Di heman rojê de çeteyan êrişî Eyn Îsa, Şedadê û Reqayê kirin.
Li aliyê din jî çeteyên hikumeta demkî hewl didin bajarê Kobanê dorpêç bikin û di encama bersivdayîna şervanên QSD û YPJ’ê de şereke dijwar derket û çeteyên derbeyên xwarin. Şervanên QSD’ê êrişeke çeteyên hikumeta demkî li herêma Çelebiyê yê gundewarê Kobanê jî têk bir, hejmareke çete kuştin û 5 girtin. Di heman demê de çeteyan avahiya sewalvaniyê ya li bajarê Til Temirê topbaran kirin.
Piştî bi seatekê li gundê Xan Memed ê Çelebiyê yê Kobanê, dema çeteyan xwest bikevin gund, di navbera gel û çeteyan de pevçûn derket. Di encamê de zêdetirî 20 çete hatin kuştin.
Di 20 Çileyê çeteyan 5 caran êrişî gundewarê Sirînê kirin û di bersivdayîna QSD-YPJ êriş hatin şikandin û di encamê de 7 erebe û 4 panzêr hatin îmhakirin û 4 dron hatin xistin.
Di heman rojê de li gundewarê bajarê Hesekê jî çeteyan dema ku xwestin êri bikin, şervanên QSD û YPJ’ê li wan dan û wesayîteke leşkerî ya çeteyên hat rûxandin. Şervanên QSD û YPJ’ê li herêma Bendava Tişrînê jî 5 caran hewldanên derbasbûna konvoyên çeteyên hikumeta demkî têk birin û 6 çete hatin kuştin.
Li başûrê Kobanê, Pira Qereqozaq, gundê Til Barûd ê başûrê rojavayê Hesekê, kampa Holê, bajarokên Til Hemîs û Til Birak çeteyan bi çekên giran êriş kirin û rastî bersiveke tund a şervanên QSD-YPJ hatin û di encamê de windahiyên mezin yên çeteyan çîbûn.
Di heman rojê de li bajaroka Til Koçer ê Kantona Cizîrê û riya Hesekê Reqa jî çeteyan êriş kir, şervanan jî bersiveke tund dan êrişê çeteyan.
Di 21’ê Çileyê de komên çete êrişeke mezin birin ser bajarê Sirînê û gundên Cadê, Qubê û Hemdaş ên bajarê Kobanê. Herwiha bajarokê Zergan û Til Temir jî rastî êrişê çeteyan hat.
Di 22 Çileyê de komên çete yên girêdayî hikûmeta demkî ya Suriyeyê êrişeke mezin birin ser bajarê Sirînê.
Di 24 Çileyê de çeteyan bi 2 dironên xwekuj êrişî gundên Sefa yê başûrê bajarê Çilaxayê kirin û di encamê de 2 şervan birîndar bûn û dronek hat xistin.

**Agirbesta 15 rojan**

Di Roja 24’ê Çileyê saet 23: 00 de QSD’ê ragihand ku bi navbeynkariya navneteweyî wê û hikumeta demkî ya Sûriyeyê li ser dirêjkirina dema agibestê bo 15 rojan li hev kir, di heman demê de diyalog jî dewam dikin. Lê li gorî tê texmînkirin wê ev agirbest jî ji aliyê çeteyan ve bê binpêkirin.

# Kadar Pîrê: Ji bo parastina Rojava tevlî seferberiyê bibin

**Rêveberê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê bang tevahî gelê Kurd li çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê kir ku ji bo parastina Rojava tevlî seferberiyê bibin û rûmeta xwe biparêzin.**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê planên dewletan li Rojhilata Navîn, rewş û berxwedana Rojava û banga seferberiyê li Rojava, Rêveberê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê berisva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Çi proje li Rojhilata Navîn hene, herwiha rewşa Kurdan di nav de çawa ye?**

Destpêkê ez silaveke gerim ji her çar parçeyên Kurdistanê, berî her tiştî şervanan û hemû kesên di seferberiya hatiye ragihandin de tevlî dibin, dişînim. Çima Kurd? Ji ber di Rojhilata Navîn de proje hene, her kes dixwaze projeya xwe bide pêş, projeya Kurdan jî hebû, lê cûda bû ji van projeyên din. Projeya Kurdan ku her kes hevbeş bi hev re jiyan bikin, kes kesî qir neke. Lê projeya Tirkan hebû ku dîsa mijara netewa xwe ya Osmanî, yan jî koletiya van pêkhateyên din di bin baskê xwe de bicî bîne. Projeya Îran jî ku bi navê mislimatiyê û Şîa dixwest serweriya xwe li ser herêmê giştî bikin, berê digotin; Heyva Şîa heta bi wan re gihaşt ku destê xwe deyînin ser giştî û eşekere jî digotin; çar paytextên ereban di bin kontirola me de ne wekî Bexda, Beyrût, Şam û Yemen. Lê niha projeya wan şikest, pişt wan derbeyên xwarin baskê Îran di Sûrî, Lubanan û Yemen de hat jêkirin û niha tenê bi xwe mijûle ku çawa xwe xelas bike. Îsraîl û hevalên wê li aliyekî, Tirk û hevalên wê li aliyekî din, her kes dixwaze projeya xwe bide pêş. Li vir netewa Kurd di ortê de ye, Kurd jî her kes fêm kiriye. Herwiha ji bo Rojhilala Navîn ku 4 dewletên sereke tê de hene Sûrî, Îraq, Tirkî û Îran, di van 4 dewletan de jî Kurd beşê sereken e, beyî Kurdan wê nebe.

Mixabin Tirkan fêm kiriye ku hebû Kurdan tunebûna wan e, wan fêm nekiriye ew jî em jî dikarin jiyan bikin, ji vê ew li tunbûna Kurdan digerin, ev jî li ser erdê îro tê xuyankirin çiqasî dixwazin ku Kurdan tune bikin. Lewma wan hemû şêwaz bikaranîn ji bo tunebûna Kurdan, lê bi dest wan neket. Îro jî di nava van guhertinên ku di Sûriyê de bûn, Tirkan dîs rola xwe xurt kir û biser ket ku karîbû destê xwe deyîne ser paytexta Sûriyê û cihê biryarê bixe bin kontirola xwe. Herwiha çi danûstendinên di navbera Kurdan, Rêveberiya Xweser û hikumeta demkî ya Sûriyê de bicî bê û çi îmze bibe ku sûd be ji Kurdan re, Tirk mudaxele kiriye û xwestiye hemû danûstendinan têk bibe, ji ber projeya di serê wan de tunekirina Kurdan e, ji bo wê Tirk şer dixwazin.

**Gelo wê Kurd heya çi radeyê karibin parastina hebûna xwe di Rojavayê Kurdistanê Sûriyê de bikin û wê mafê wan pêk bê, yan jî wê zextek dîsa bê kirin ku tiştan ji dest xwe bidin?**

Mijara tişt ji destê Kurdên li Sûriyê bên berdan gihaştiye asta dawî, asta ku veger nema jê heye, parastina gelê Kurd e. Mijar nema mijara Dêr Hafir, Tebqa, Reqa û Dêra Zorê ye ku ew li xwe qebûl dikin, xiyanet bikeve mijarê de û kesan xwe firot, istixbaratê dewleta Tirk hatin bikaranîn û şikenandin di wir de çêbûn. Ev ne mijara serkeftin ji wan na re ye, şer e tu li cihekî dişke û li cihekî biser dikeve. Lê em gihane astekê yan wê ev rêkeftinên ku aniha bibin bi rengê wan tev çiqasî kêm bin jî, ji ber tiştê Xweseriya Demokrat û Kurdan bedelên ku dan cîhanê, ew jî bi vî rengê nebaş qirêj li me vegerandin ku DAIŞ dîsa vegerandin wek berê, ala DAIŞ li ser Reqayê dîsa bilind kirin û gotin va paytexta me li me vegeriya. Li paş vê veger zêdî wê nemaye. Di qedera demeke kurt de tişt tên guhertin weke ev lihevkirina ku bû, piştî lihevkirina hikumeta Colanî û Îsarîl bi serkêşiya dewleta Tirk û li ser lihevkirinên li Parîsê rawestiya bûn, peştî wê ev êrişên niha pêk hatin. Çiqas lihevkirin hebûn ku pêwîst bû bihata îmzekirin, lê dîsa bi zexta Tirkan nedihişt Colanî îmze bike, taybet ê bi nav Wezîrê Karê Derve Şêbanî wî dixwest xera bike, eşkere ev zilamê Tirka ye. Lê îro tişt di kêliyan de tên guhertin, hemû dîmen belgekirîne ku çawa qirkirin û kuştinê dikin, eşkere hemû DAIŞ in. Li hemberî vê jî dîsa hevalên Kurdan li cîhanê belavbûyî pirin, li Amerîka, Fransa, Almanya, di asta gel de be yan jî di asta sînatora, perlemanî, hikumet û serokê hikumeta bin, piştgiriya me pir heye. Niha jî tenê du vebijêrk hene yan ew ê qebûl bikin, yan em li ber xwe bidin, ji bo berxwedan jî hewce nake kes şîreta li me bike, ji ber ev gel ne ê şîreta ye, gelekî berxwedêre. Ez hatim Rojava min digot ez hinekî moral bidin gelê xwe, lê xuya kir ez şaş bûm, ez moral ji wan digirin. Ez şikestî hatibû Rojava, lê îro ez di hundirê Rojava de pir geşim.

**Tu berxwedana gelê Kurd li ser asta Kurdistanî çawa dinirxîne?**

Niha em gihaştine astekê ku em bêçare ne biryarên kêm zirar bistînin. Tu biryara teslîmbûn bide, tu zane tê tune bibe, ji xwe biryara teslîmiyetê jî li cem Kurdan tune ye, ji ber me di dîroka Kurdan de û ji ferhenga zimanê xwe jî ev gotin rakiriye, hem şervan hem siyastmedar. Vebijêrk li pêşiya me ne, hun qebûl dikin ev tiştê herî kêm bighê me, mijara cih û warê Kurdan em biparêzin ku ev çete derbas nebin. Derbasbûna van çeteyan ne gerek bêjin wê çawa bibe her tişt zelal û berbiçave, derheqê Siwêda û Beravê de çikirin, eyîn tişt li vir jî bi deh taq wê bi serê me bê. Ji ber dema êrişî van deveran kirin gef li me dixwarin. Lê em tu carî weke wan nahizirin, em tu carî ne şerxwaz bûn, em tim xêrxwaz bû, lê em ji mafê xwe jî venager in.

**Rojavayê Kudistanê bû xeta parastina hemû parçeyên Kurdistanê, ji bo wê ger dema agirbestê bidawî bibe û berxwedanî berdewam bike, wê gelê Kurdistanê û yên li derve çi rolê bilîzin di serkeftina Rojavayê Kurdsitanê de?**

Tecrûbe di vê de heye, şerê Kobanê ku çiqase Kurdên ji derve diyaspora alîkar bûn, bi meş û çalakiyên ku lidar dixistin cîhan hemû bi êşa me agehdar kirin û hiştin cîhan bikeve nava tevgerê de. Îro jî eyîn çîrok dûbare dike Kobanê di çeperê de ye, dixwazin dîsa wê tune bikin, ew wek kelemek di mejiyê Tirkan de ye ku li Kobanê ew şikestin, projeyên wan a DAIŞ ku berê wan dabû Kurdan şikenandin. Niha jî gelê Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê û cîhanê li ser piya ne. Ji ber Kurdan fêm kiriye Rojava ne tenê Rojava ye, tunebûna Rojava tunebûna her çar parçeyên Kurdistanê ye. Ji ber heger Rojava bikeve wê Başûr bikeve, Bakur winda bibe, Rojhilat jî berê cîhanê hemû çavê xwe li ser êşa wan girtiye. Başûrê Kurdistanê jî ev mijar baş fêm kiriye û li gorî wê gavan diavêje, ragihandina Başûr jî pir alîkar bû. Ji bo wê ez di rêya Rojnameya Ronahî de dixwazim spasiyeke mezin bighînim wan, lê pêwîst e hîn ji vê xurtir bin. Li kêlek vê çalakiyên Kurdan li diyaspora berdewam e, li Fransa ser piyan e, Parîsê nahêlin razên, li hemû deveran bi vî rengî gelê Kurd rabûne, ev yek jî divê berdewam be. Bangeke jî ji wan re ku kesên karibin xwe bighên Rojavayê Kurdistan tevlî parastina xakê û gel bibe, pêwîst e werin, yên li wir jî bi hemû hewldanên xwe dengê gelê derxînin ku ev gel ber bi qirkirinê ve dire. Li hemberî her tiştî jî ez di wê baweriyê de me serkeftin a me ye.

**Di aliyê dîplomasî de em ê çawa bandorekê bikin û dorpêçê li ser Kobanê rakin herwiha alîkariya Kurdan di Rojavayê Kurdistanê de bibe?**

Kurdan di van 10 salên dawiyê de dest bi karê dîplomasî kiriye, ji ber berê siyaseta me navxweyî bû ne siyasetek cîhanî bû ku em danûstendinê bi xelkê re bikin, ragihandina me ji bo me bû. Lê dijminê me, yek jê dewleta Tirk werîsê Osmaniya 400 sal e, irsekî wî yê diplomasî 500 sal heye, ew her tiştî li dijî me bikar tîne. Lê îro roj siyaset û dîplomasiya cîhanî bi lobiyata tê meşandin, lobiyê te hebin wê ji te re kar bikin, lobiyê te tune bin, ji xwe tê tune be, ev lobiyat jî eşkere ye û bi peran kar dikin. Xweseriya demoratk jî divê balê bikşîne li ser vê mijarê û bi rengekî lezgîn bi lobiyên Amerîkî û Fransî re di nava têkiliyan de be, ji ber îro em hewceyî hemû dengî ne. Ji ber lobiyat diçin cihê biryarê, ew bi fermî kar dikin û piştgiriyê dikin, piştgiriya me jî çi ye ku em vî gelî ji qirkirinê rizgar bikin.

**Çi cûdabûna êrişên roja îro ji êrişên DAIŞ'ê ne?**

Tu cûdabûn tine, tenê nav hatiye guhertin. Kes ew kes in. Projeyên wan hene, ji wan re ne derde çiqas sivîl koçber bibin û bên kuştin jî, ya girîng projeyên wan pêk bên.

**Bang û daxwaziya te çi ye?**

Banga min tenê ji gelê Kurd ên çar parçeyên Kurdistanê re ye ku yên karibin werin tevlî seferberiyê bibin bên, ji ber dema rûmetê ye. Di heman demê de hat xuyakirin ê te biparêze û li pişta te be, gelê te ye. Lewma pêwîst e gelê me li ser piya bin û çalakiyên xwe berdewam bikin û dengê Kurdan bighînin hemû cîhanê.



## Nexşeya Netanyahu ya Reş

**Farûk Sakik**

Serokê Îsraîlê Binyamin Netanyahu, di 27'ê Îlona 2024'an de di dest wî de 2 nexşe hebûn. Wî ev 2 nexşe wek Nîqmet: xeta enerjiye, ji Hindîstan heta Ewrûpa û Nalet: welatên Lubnan, Sûrî, Iraq û Îran pênase kiribû. Nexşeya nalet de sînorê Lubnan, Sûrê, Iraq û Îran hatibû reşkirin.

Wê ji Sûrî dest pê kirina. Ji bo vê plana xwe pêk bîne astenga herî mezin Îran bû. Li Lubnanê bi tasfîyekirina Hamas û Hîzbûllah dest pê kir. Roja di 27'ê Mijdarê de Colanî û çeteyên wî ji Îdlibê bi rê xist, ev plana xwe xist meriyetê. Di vê nexşeya reş de Rojava, Başûr û Rojhilatê Kurdistan jî hebû.

Dema Tirkiyê ev nexşe dîtin got, ihtimal e ku 3 parçeyên Kurdistan di vê nexşeya reş de statuyên xwe bi dest bixe. Dema ku Bahçelî behsa metirsiya Îsraîlê dikir, 3 statuyên Kurdan ew tirsandibû. Bi Rêber Apo re xwest pêşî bigire, dema gotina xeta sor bihîstin, li rêyek din geriyan.

Dema ku ji bo guhertina nexşeya Rojhilata Navîn, li Sûrî rejima Baas rûxandin, Tirkiyê di çentê wî de qarta Nato, derbasî Qesra Spî bû. Ji bo Trump kêfxweş û îqna bike, îmzeyên bazirganiyê avêtin.

Sozek din dan ku di şerê li dijî 3 dewletan(Îran,Sûrî,Iraq) de li kêleka Amerîka cih bigire. Ji bo îqnakirina Îsraîl jî, soza li hember rewşa filistiniyan bêdeng bimîne.

Soz û li hevkirina bi Tirkiyê re, di 6'ê Çileya 2026'an de dest pê kir. Piştî êrişên 2 taxên Helebê-Şêxmaqsûd û Eşrefiyê, berê xwe dane hemû heremên rêveberiyên xweser a demokratîk.

Piştre dor hat Iraqê. Dema şerê çeteyên HTŞ û Tirkiyê dewam dikir, li sînorê Iraqê liv û tevgerek dest pê kir. Haştî Şabî li serenserê sînorê Iraq û Sûrî hatın bicîh kirin. Li Baxdayê îro rewşek awarte heye. Di kêliyên min ev nivîs dinivisî, Tugayên Hîzbûlaha ya Iraqê li hember Amerîka seferberi îlan kir.

Lê li aliyek jî tehdîtek mezin li ser herêma Başûrê Kurdistan heye. Em vê yeke di reng û peyamên Mesûd Barzanî de dibînin. Rewşa Başûrê Kurdistan di bin xeteriyek mezinde ye. Tirkiye ji bo ku vê federasyona herema Kurdistan ruxîne dest bi amadekariyan kiriye. Kerkûk û Mûsil di hedefa wan dene. Hakan Fîdan dest bi tehdît-gefên Şengalê kir.

Û li Îranê piştî gel dest bi serhildanan kir, Tirkiye ji bo li her ihtimalî Kurd nebin xwedî statuyek, bi rejîmê re di nav danûsandinan de ne. Ev nayê wê wateyê ku sozê dane Amerîka destberdane. Bi her dû aliyan re di temasê de ye.

Kurd jî li hersê welatan, ji bo axa xwe û sîstema xwe biparêzin li ber xwe didin. Berxwedaneke mezin îroj li Rojava ye. Êrişî rêveberiya xweser ya Rojava dikin. Kobanê bi rojan bû dibin dorpêçê de bû.

Bi zanebûn agirbest îlan kirin û li benda 26'ê Çile man.

Di sala 2015'an de di 26'ê Çileyê de, Kobanê di encama berxwedaneke dîrokî de hatibû rizgar kirin. Ne bi tenê Kobanê heman demê de hemû mirovahî ji van çeteyên hov rizgar kiribû. Kobanê wijdanê mirovahiyê bû.

Îroj wa bi hovîtiyek mezin êrişî Kobanê dikin û ew wijdanê mirovahiyê reş bûye. Li ber çavên wan zarokên Kurdan tên qetilkirin û bêdeng in.

Divê were zanîn Kobanê bi tenê bajarek nîne. Kobanê îro wek neynika ku cîhanmirovahî ketî çi halî ye. Lê aliyênkesên ku cesaret nakin li vê neynikê binêre, wê di paşerojê de-di dîrokê de, bi vê pirsê re rû bi rû bimîne. Dema ku Kobanê di bin dorpêça qirkirinê de bû tu li ku derê bûyî?



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvan Vejîna Kurd "Vedenga birînên Efrînê û qêrîna jina Kurd a berxwedêr li hemberî zilmê."

Jina Kurd di qadên jiyanê de tu carî ne sîberek, ne şopdar û ne jî kêmtir bû ji mêr di têkoşîn, nivîsandin, serokatî, siyaset û fedakariyê de...

Li kêleka wî rawestiyabû û hîna jî heye, bi destekî dergûşa zaroka xwe dihejand û bi destê din jî bi diwêta pênûsa xwe, bi bedewiya peyvên xwe û bi rehwanbêjiya helbestên xwe dinya dihejand.

Ewe ya ku peyvê dike şûr, pênûsê dike xetîre û helbestê dike bircek ku milet ji windabûnê diparêze. Ewe ya ku hêviyê di dilan de diçîne, wijdanê ji qeyd û bendên tirsê rizgar dike û giyan avdide ji kaniyên azadiyê.

Di nav van de stêrka helbestvana Kurd Vejîna Kurd diçirise, ew yek ji dengên jinên hemdem ku ala parastina mîrateya çandî û wêjeyî, ziman û nasnameya Kurdî hilgirtiye li dijî hewldanên înkar û pijavtinê, tekez dike ku hebûna jinê ne xemil e, lê hêzek pêdare û ronahiyek ku qet venamire. Helbest, vegotin û wêjeya wê neynika ruhê kurdewarî ye ku behsa jiyan, evîn û sekna wê dike.

Di her dilê ku dixwîne, tovê hêz û rûmetê diçîne, da ku jin bibe semboleka zindî ya azadî û hêviyê û parêzvaneke peyama peyv û civakê. Li feraşînên bedew ên çiyayê Kurmênc, ku poz û qopên çiyayên Hawar û Lêlûnê ewran himbêz dikin û di dîmenek bi heybet û bedewiyê de diherike û zeviyên ku bêhna zeytûnan û kulîlkên hinaran jê dibarin, ... û simbilên genim di bin henaseya bayê de digirin sema mîna sirûda jiyanê ku qet namire. Li wir, di hembêza Efrîna şênber de, bûka Rojava ya ku bêhna bîranîna Hûrî û Mîtaniyan hê jê dibare, helbestvana Kurd Zefat Henan ( Vejîna Kurd) di sala 1975'an de ji dayîk û bavek Kurd (Cemîl Ebdil Henan û Rehîme Mamo) li gundê Maratê yê girêdayî Efrînê di nav malbateke kurdperwer ya neteweyî û kedkar de hatiye dinyayê, dê û bavên wan ew li ser nirxên resen ên kurdiyatiyê mezin kirin, hezkirina welat, dilsoziya bi xaka xwe re û girêdana bi dîroka xwe ya kevnar re di nav wan de çandin. Wê zarokatiya xwe li deverên bedew ên gundê xwe ku bi bêhna ax û nanê germ ê tenûrê jê difûre, di nav zevî û girên ku çîrokên bav û kalên me vedigotin û di bin siya zeytûnan de ku ji bayê re sira jiyanê digotin, derbas kir.

Wê çavên xwe li ber tîrêja ronahiya spêdê ya ku di navbera şitlên zeytûnê de diherikî vedikir, guh dida li awazên xwezayê û bi sira bayê re dipeyîvî wek hevalekî ku xewnên xwe yên piçûk pêre parve dikir, wê gul û kulîlk ji mêrgan kom dikir û li pey pirpirîkên li ser dêmên gulan dibeziya û dikete pêşbirkê bi çivîkan re di nav darên buxçeyan de.

Wê guhdarî dikir li yekem stranên kurdî yên ku diya wê di dema hevîrê nanê tenûrê distiran de digotin, wê ji bayê çîrokên xwe, ji axê rehên xwe û ji ronahiya sibê zimanê xwe yê yekem werdigirt. Ji wan kêliyên pêşîn çirûska afrîneriyê di dilê wê yê biçûk de derket holê.

Di hembêza germ a Efrînê de ber bi vederbûna bêdeng ve diçû, li wir wê xwe bi pirtûk û defteran mijûl dikir bêtir ji lîskê, li dengê tîpan guhdarî dikir, mîna ku ew awazeke veşartî be ku bang wê dike ji kûrahiya zeytûnan û dîrokê. Vejîn xwendina xwe ya seretayî û amedeyî li dibistanên Efrînê qedand, piştre xwendina xwe li Helebê berdewam kir û li wir xwendina xwe li Saziya Amadekirina Mamosteyan - Beşa Îngilîzî qedand, piştre vegeriya û li bajarê Efrînê mamostetî kir.

Di sala 2012'an de tevlî Saziya Perwerde û Parastina Zimanê Kurdî li Efrînê bû û li wir rêzimana zimanê Kurdî xwend û piştî demeke kin bû endamek û mamosteyek çalak di saziya Perwerdeya Zimanê Kurdî de û serpereştiya kursên taybet ên zimanê Kurdî dike û ruhê serbilindiyê bi nasnameyê û zimanê dayikê di nav nifşên nû de belav dike.

Di heman salê de wê û komek jinên Efrînî Komeleya "Rewşen Bedirxan" ya ji bo jinên Kurd ava kirin, ew însiyatîfeke çandî ya jinan bû, ku projeyek pêşeng ji bo ku bikarin jinan ji hêla çandî û wêjeyî ve xurt bikin. Vejîn yek ji stûnên wê yên herî berbiçav bû, karî hevrêzîyek di navbera hişmendiya civakî û pabendbûna afirîner de ava bike. Herwiha wê berpirsiyariya rojnameya "Rewşen" dikir a ku bi zimanên kurdî û erebî derdiket, ew rojname diyar bû ji ber ku ew mehraveka pênûsên jinan bû, di rûpelên wê de bi dehan nivîskar û helbestvanên jin dinivîsand, 26 hejmarên rojnameyê hatin weşandin û piştî dagirkirina Efrînê weşana xwe rawestand, bi vî awayî rûpeleke geş a Dîroka ragihandina azad li bajêr Efrînê hate girtin.

Wê bi nivîsandina helbest û gotarên edebî dest bi rêwîtiya xwe ya torevaniyê kir, ji salên xwe yên destpêkê ve di saziya fêrkirina zimanê kurdî de, pênûsa xwe ji bo xizmeta çand û zimanê kurdî terxan kir û hêdî hêdî pênûsa di destê wê de bû dengê jinên serhildêr ku xemgînî û hêviyê bi hev re diyar kir.

Helbestvana kurd Vejîn zewicî ye û dayîka çar zarokan e. Piştî dagirkirina herêma Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ve, bajarê xwe yê ku gelek jê hez dikir û li ser nivîsandibû, derket, li pey xwe malbata xwe hişt, bîranînên xwe yên zarokatiyê û xeyalên xwe û di çavên wê de lehiya rondikan û di dilê wê de hezar kul û keser.

Piştî salên şer, êş û xerîbiyê, Vejîna Kurda xwe neçar dît ku di sala 2018'an de ji Efrînê derkeve, di çenteyê xwe de hindek cilûberg û gelek bîranîn û helbestên ku hîn nehatine temamkirin hilgirtiye û derbasî bajarê Helebê bû.

Di sala 2023'an de koçî Holandayê bû û li wir çîroka xwe di navbera xerîbî û welat, di navbera sirgûn û hesretê de xêz kir, lewra nivîs bû welatê wê yê bedel(alternatîf) û germahiya giyanê wê li welatekî sar. Li xurbetê agirê wê yê afirîner venemirî, berevajî vê xurtir û geştir bû û wê dest bi hûnandina cîhanên xwe yê wêjeyî kir bi xêzê ronahî, xemgînî û hêviyê. Ji wir, wê peywira xwe ya perwerdehî û çandî berdewam kir, qursên elektronîkî ji bo hînkirina zimanê kurdî li dar xist û di gel parastina xetîreya xwe yê yekem ku nehatî vemirandin. Li penaberiyê hîn jî dinivîse, diweşîne û mamostetiyê dike, mîna ku nivîsandina beşek nû ji çîroka Efrînê didomîne, ya ku lê rûdine û tê de jiyan dike tevî dûrbûnê.

Vejîna Kurda afrîneriyê dike di nivîsandina helbesta kurdî ya nûjen, hebesta azad û pexşan de û berhemên zindawer ku dirûstbûn û bedewiya hunerî derdixe pêş çavan pêşkêş dike. Afrîneriya wê tenê bi vehûnandina helbestan re sînordar nema, lê gihişte cîhanên vegotin, roman û kurteçîrokan û îspat kir ku afirînerî ji bo wê ne erkekî derbasbûyî ye, lê rojgar û çarenûsek e ku di giyanê wê de diherike û nasnameya wê ya wêjeyî diafirîne.

Di nav berhemên wê yên wêjeyî yên çapkirî de, ku pirtûkxaneya edebî ya kurdî bi rastbûna xwe ya mirovî û germahiya hestyarî dewlemend kirine:

1. Xewnên Elendê - Helbest, Efrîn 2016, çapa duyem, Qamişlo 2022.
2. Hawarine Efrînê - Roman, Qamişlo û Almanya 2018.
3. Pencereyên Êşê- Komek kurteçîrok, Almanya 2019.
4. Gulistan Pîr Nabin – Helbest, Almanya 2019.
5. Rûmet - Roman, Kobanê -Weşanxaneya Ava 2020.
6. Nexşeya Êşê– Roman, Weşanxaneya Ava, 2025.

Vejîn ne helbestvanek bû ku ji civaka xwe veqetiyabû, lê ew beşek ji tevgereke çandî ya jinên Kurd bû û di wê baweriyê de bû ku jin di dîrokê de ne peyreweke di dîrokê de, ew ronahiyeka wê ye ku wê dinivîsîne.

Ew beşdarî çivat û semînerên edebî û çalakiyên neteweyî yên li hundir û derveyê Rojava bûye û rolek girîng lîstiye di damezrandina şaneyên çandî yên ciwanan de ku eleqedar bûn bi hînkirina zimanê kurdî ji nifşên nû re, ji ber ku bawer dikir ku ziman dilê nasnameyê û bîranîna wê ya zindî ye. Wê nivîsiye li ser welatê birîndar ku namire, li ser keça kurd a ku ala neteweyî bi tayên keziyên xwe vedihûne, li ser çiyayê ku nehêniyên şervanan vedişêre, li ser dara zeytûnê ya ku li ber agir li ber xwe dide û li ser dayikek kurd a ku sebrê bi xêzên bendewariyê dirêsîne.



Helbestvan Vejîna Kurda beşdar bûye di çend pêşbirkên wêjeyî de û amadebûna wê di wan pêşbirkan de bi saya xebata wê ya afirîner û keda wê ya berdewam di warê helbest û kurteçîrokên kurdî de berçav bû, di heyama rêwîtiya xwe de, wê çendîn xelat û bawernameyên rêzgirtinê ji dezgehên wêjeyî yên pispor wergirtine, rêzgirtin ji bo ked û dayîna wê û cudabûn û jêhatîbûna wê ya wêjeyî. Di sala 2018'an de, wê di Festîvala Helbesta Kurdî de, ku ji aliyê Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê hatibû lidarxistin, xelata Cegerxwîn wergirt, tekezî ji bo hebûna wê ya berbiçav û dengê wê yê resen di qada edebiyata kurdî ya hevdem de. Di sala 2020 de, wê ji bo çîroka xwe ya "Veger" di Heftemîn Festîvala Huner û Wêjeya Jinê de xelata yekem wergirt. Di sala 2024'an de çîroka wê ya bi navê "Pelîn" di nehemîn festîvala çîroka kurdî li bajarê Qamişlo ku ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê ve hatibû rêxistinkirin, pileya duyem bidest xist. Bi vî awayî, Vejîna Kurda dimîne yek ji wan dengên jin ên ku ezmanê edebiyata kurdî ya hevdem ronî dike, helbestvaneke ku ne bi sirgûnê vemiriye, ne jî bi birînan westiyaye, lê wê ji êşên xwe pir avakirin ber bi bedewiyê ve û ji helbestên xwe sirûdên evîna ax, nasname û azadiyê afirandin..

# Nerazîbûna welatiyan li hember bilindbûna fatoreyên elktrîkê li Sûriyê

Bilindbûna fatoreyên alektirîkê ji aliyê hikumeta demkî ya Sûriyê ve bûye cihê nerazîbûna gel, ji ber ku ev kiryar barê welatiyan girantir dike û bandoreke neyênî li jiyana wan dike.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di nava şert û mercên dijwar û zehmet ên ku gelê Sûriyê tê de derbas dibe, bi taybet piştî hilwişîna rêjîma berê, polîtîkayên hikûmeta demkî ya Şamê wekî faktorek sereke xuya dike ku aloziyan girantir dike bi taybet aloziyên jiyanî, ji ber ku berê xwe daye gelê kurd da ku wekî rêjîma berê wan bide helandin û rewşên jiyanî ya welatiyan paşguh kiriye.

Li şûna ku çavkaniyên dewletê ber bi baştirkirina jiyana welatiyan û sivikkirina êşên wan ve werin bikaranîn, ev çavkanî ji bo şerê li dijî gelê Kurd têne bikaranîn, di hewldaneke mezin de ku hedef dike hebûna wan tune bike, pêşeroja wan bixe xeteriyê de û qirkirinan der heqê vî gelî pêk bîne bi piştgirya rasterast a deweleta Tirk a dagrker ku gelê kurd wekî dijmin ji xwe re esas girtiye, di heman demê de çend dewletên erebî ku destwerdanê di kar û barên Sûriyê dikin û aramnca hemûyan jî ew e dewlemendiya vê xakê ye bi taybet destserkirina petrolê.

Hikumeta demikî ya Şamê piraniya gelê Sûriyê bi xizaniyê û paşguhkirinê rû bi rû hiştiye, ji pirsgirêkên av û elktrîkê û hwd.. niha rojeva gelê Sûriyê yê hundir fatoreyên elektrîkê ye, ku ji milyonek lîreyên Sûrî derbas dibin di demekê de ku piraniya gel di bin xeta xizaniyê de dijîn û nikarin pêdiviyên herî bingehîn jî peyda bikin.

Ev nakokiya eşkere di navbera xerckirina li ser pevçûnê û paşguhkirina pêdiviyên bingehîn de aloziyeke kûr a rêveberiyê eşkere dike, civakê bi pirsgirêkên hebûnî re rû bi rû dihêle ku hesabpirsîn û polîtîkayên alternatîf ên ku rûmet û rêzgirtina mafên mirovan vedigerînin, hewce dike.

### Pirsgirêka elktrîkê li Sûriyê

Rewşa jiyanî li Sûriyê bi sepandina fatoreyên nû yên elektrîkê re pir xirab bûye. Ji bo gelek malbatên Sûriyê, lêçûna elektrîkê niha ji lêçûna xwarinê zêdetir e, ku ev jî cudahiya mezin di navbera dahata malbatê û barê zêde yê lêçûnên enerjiyê de nîşan dide.

Ev pirsgirêk ne tenê encama kêmkirina alîkariyê ye, lê di heman demê de ji têkçûna hikûmetê ya pêşxistina stratejiyek aborî ya berfireh ku jiyanek baş ji bo welatiyên Sûriyê garantî dike jî tê, nemaze ji ber asta dahata kêm, kêmbûna derfetên kar û veqetandina çavkaniyan ji bo sektorên ewlehî û leşkerî.

### Fatoreyên elktrîkê barê gel girantir dike

Fatoreyên elektrîkê li Sûriyê bûne mijara nîqaşeke berfireh li ser medyaya civakî, bi derxistina fatûreyên yekem piştî biryara Wezareta Enerjiyê ya zêdekirina bihayên elektrîkê ji sedî 600 zêdetir di dawiya sala borî de, gelê Sûriyê dest bi parvekirina wêneyên fatûreyên xwe yên nû kirin li gorî dahata xwe ya mehane ferqê behs dikin, ku gelek fatore gihaştine 4 milyonan.

Ev fatore, ku vedigerin serdemên fatoreyên Mijdar û Kanûna 2025'an, ji hêla welatiyan ve wekî bêhempa û ne mentqî hatine wesifandin, ku mîqdarên wan gihîştine astên ku gelek kes ji derfetên xwe yên darayî wêdetir dibînin.

Daneyên navneteweyî nîşan didin ku bi qasî %90'ê ji gelê Sûriyê di bin xeta xizaniyê de dijîn, di heman demê de nêzîkî sêyeka wan ji xizaniyek dijwar dikişînin, ku fatoreyên nû yên elektrîkê barekî zêde li ser malbatan dike.

Li gorî rewşên ku di medyayê de hatine ragihandin, fatore ji sed hezaran heta bi mîlyonan lîreyên Sûrî diguherin.

Her ku hêrs zêde dibû, bang li ser medyaya civakî belav bûn û ji mirovan xwestin ku fatoreyan nedin, di heman demê de yên din jî banga xwepêşandanan li dijî tiştên ku wan wekî bihayên ne maqûl bi nav kirin ku ji rastiyê dûr in, kirin.






### Fatoreyên bilind

Berî çend mehan, hikûmeta demikî ya Şamê biryar derxist ku tarîfeya elktrîkê zêde bike, di çarçoveya hewildanên kêmkirina windahiyan û reformkirina sektora elktrîkê. Lê belê pêkanîna pratîkê ya biryarê di rêya dewreyên dawî yên fatoreyan, valahiyeke zelal eşkere kirin di navbera xîtaba fermî û rastiya jiyanî de.

Bi hezaran welatî matmayî mane ji ber fatoreyên ku du qat zêdetirî wekî ku berê didan, heta di malên ku tenê di çend demjimêrên pir kêm de elektrîk werdigirin de jî.

### Beyî şert û mercên welatiyan bigrin guhertin hatin pêkanîn

Li gorî çend pisporên aborî, divê her reformek di sektora elektrîkê de li ser bingeha hevsengiyekê be ku di navbera lêçûnên hilberînê, kapasîteya darayî ya dewletê û hêza kirîna welatiyan li ber çavan bigire. Lêbelê, ev reform bi rêkûpêk nehat pêkanîn, ji ber ku guhertin bêyî ku şert û mercên civakî û aborî yên welatiyan li ber çavan bigirin hatin bicihanîn, ev yek di navbera xizmeta ku tê pêşkêş kirin û lêçûna pêwîst de valahiyek eşkere çêkir.

Li gorî Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê, Di vê çarçoveyê de êşa welatiyan hîn bêtir eşkere dibe, ji ber ku saetên elektrîkê yên ku ew distînin bi tevahî ne li gorî mîqdara fatoreya wan in, ev yek jî cudahiya di navbera xerckirina rastîn û lêçûnê de neheq dike. Wekî din, gelek malbat neçar dimînin ku tenê ji bo çend saetan elektrîkê pereyên pir zêde bidin, ev yek jî hesta neheqiyê di nav welatiyan de zêde dike.

Ji ber vê rewşa dijwar, gelek welatiyan dest bi alternatîfan kirine, wekî pergalên enerjiya rojê, da ku barê xwe yê darayî sivik bikin. Lêbelê, welatiyên Sûrî careke din bi lêçûnên pir zêde yên sazkirina van pergalan re rû bi rû dimînin, ku ji ber bihayên bilind ên alav û amûrên pêwîst, dê gelek malbat nikaribin peyda bikin.

Malbatên kêmdahat ji van guhertinan herî zêde bandor dibin. Bi kêmbûna mûçeyan re, dabînkirina pêdiviyên bingehîn ên wekî xwarin, xanî, veguhastin û perwerde pir dijwar bûye, ev yek fatoreyên elektrîkê dike barekî zêde ku aramiya wan a rojane dixe xeterê.

### Hûrgiliyên fatoreyên nû

Derbarê hûrgiliyên bihayê nû de, lêçûna her kîlowat-saetê ji bo asta yekem a xerckirinê gihîştiye nêzîkî 600 lîreyên Sûrî, lê lêçûna asta duyem gihîştiye 1400 lîreyan. Ev tê wateya ku malbatên Sûrî yên dahatên wan kême wê di navbera 800,000 û 3 milyon lîreyên Sûrî (pereyê kevin) de ji bo her dewreyek fatoreyê bidin, ku şert û mercên jiyanê yên jixwe dijwar bi giringî xirabtir dike, nemaze ji ber hêza kirînê ya kêm a welatiyan.

Bandora vê guhertinê ne tenê bi malbatan ve sînordar bû; ew gihişt sektorên pîşesazî û bazirganî jî, di heman demê de dibe ku gef li ser bihabûna kelpelan bike, ger bazar neyê dispilînkirin û li hember yekdestdariyê bêne seikandin. Wekî din, rewşa derûnî û civakî ya welatiyan ji ber fikara domdar a li ser lêçûna zêde ya her dewreya fatoreyê xirabtir bûye, ku barekî zêde li jiyana wan a rojane zêde kiriye.

Ev fatore di demekê de tên ku mûçe û fon hîn jî di astên nizm de ne ku bi lêçûna mehane ya elektrîkê re li hev nayên, di ronahiya demjimêrên dabînkirina navber de ku hewcedariyên rojane nagirin, dê dewreya fatûreya yekem piştî bilindkirina tarîfê vediguherîne barekî nû ku li rêze aloziyên jiyanê yên berhevkirî zêde dibe. Di heman demê de tehdîdê li şiyana malbatan dike ji bo xweragirtinê.

### Daxwazên welatiyan ku buhayê fatoreyên elektirîkê ji nû ve bê nirxandin

Welatî daxwaz dikin ku Wezareta Elektrîkê fatoreyên elektrîkê yên heyî ji nû ve binirxîne da ku hêza kirîna welatiyên Sûriyê û hejmara rastîn a saetên xerckirina elektrîkê çêtir nîşan bide. Ew tekez dikin ku zêdebûna zêde ya lêçûnên elektrîkê bûye barekî zêde yê netehemûlbar li ser malbatan. Daxwazên wan li ser pêwîstiya reformên rastîn di sektorê de ne, da ku dabînkirina enerjiya erzan misoger bikin ku şert û mercên aborî yên dijwar li ber çavan bigire û barê darayî yê li ser welatiyên Sûriyê sivik bike.



# Li şûna darizandina DAIŞ ew serbest hatin berdan!

Bi salan Hêza Sûriya Demokratîk QSD'ê şerê çeteyên DAIŞ'ê li şûna hemû cîhanê dike, îro bi destekdayîna Tirkiyê û erêkirina neteweyên yekbûyî hikumeta demkî ya Sûriyê çete ji girtîgehan derdixe û ji nû ve metirsiyê li ser cîhanê ava kirine, lewma cîhan ber bi qirkirin û komkujiyên mezin re rû bi rû ye.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

### Plan û zihniyet hîn qirêjtir bûye

Piştî ewqas e sal ji şerê ku li hemberî çeteyên DAIŞ'ê tê kirin ji aliyê Hêza Sûriya Demokratîk QSD'ê ve, careke din li Sûriyê bi taybet li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi êrişên hikumeta demkî ya Sûriyê (HTŞ) re ku bi piştgiriya Tirkiyê û erêkirina navneteweyî ye, ev çete têne berdan. Dema navê DAIŞ'ê li cîhanê tê gotin yekser serjêkirin, kuştin û hwd…tê bîra mirov, îyca texmîn bike ev çete têne berdan, wê çi bikin û çi nekin. Ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, wê li tevahiya Sûriyê û cîhanê kumkujî û kiryarên dij mirovî pêkbîne. Ji ber ku çeteyên DAIŞ'ê bi desteka dewleta Tirkiyê, hikumeta demkî ya Sûriyê û neteweyên Yekbûyî tevdigerin.

### DAIŞ kî ye û çawa hat damezrandin, êrişî ku derê kir?

Ebû Bekir Elbexdadî çeteyên DAIŞ'ê weke rêxistineke xwedî fikrekî herî xerab damezirand. Têkiliyek dîrokî ya xurt di navbera van çeteyan û çeteyên Elqaida, Cebhet Elnusra de heye. Bi dirêjahiya salekê van çeteyan karîbû xwe rêxistin bikin, ji derdora 81 dewletên cîhanê xwedî nasnameyên cudane û xwe komî ser hev kirine û xwestin serweriya xwe li ser Îraq û Sûriyê pêk bînin. Piştî DAIŞ'ê di 10'ê Pûşbira 2014'an de Mûsil dagir kir û bi şûn de di 15'ê Pûşbira 2014'an de jî Telafer dagir kir. DAIŞ'ê piştî dagirkirina van herdu bajaran, vê carê jî berê xwe dane Şengalê û di 3'ê Tebaxa 2014'an de gelê Êzidî di komkujiyê re derbas kir. Gelê Şengalê û bi sedan malbatên koçber ên Mûsil, Telafer û navçeyên ku li Şengalê diman bê çare man, tenê çiyayên Şengalê wekî rêya xilasiya ji mirinê dîtin û di bin germahiya havînê de û bi meşa li ser lingan xwe spartin çiya. Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) û HPG û YJA star ji bo xilaskirina êzidiyên li çiyayê Şengalê korîdoreke mirovî vekirin. Bi sed hezaran kes ji komkujiyan rizgar kirin. Herwiha di 13'ê Mijdara 2015'an de bi qehremanî û berxwedaneke mezin, bi pêşengiya Gerîlayên Azad, YBŞ , YPG, YPJ' û HPG û YJA star Şengal ji çeteyên DAIŞ'ê hate rizgarkirin. Piştî wê gelê Şengalê xwe bi rêxistin kir û pergala xwe ya Xweseriya Demokratîk av kir.



### Êrîşa Kobanê û destana lehengî ya şervanan

Çeteyên DAIŞ'ê di 15'ê Îlona sala 2014'an de ji sê aliyan ve dest bi êrişa ser Kobanê kir, armanca wan ew bû ku di nava çend rojan de Kobanê bi temamî bixe bin serweriya xwe. Lê piştî 134 rojan ji şerê di navbera şervanan û DAIŞ'ê de, efsaneya serkeftina Kobanê bi tîpên zêrîn tevî xwînê hat nivîsîn. Piştre jî pêngava rizgarkirina gundewarên Kobanê dest pê kir. Herwiha Minbic û Reqa, heta Baxozê. Têkçûna DAIŞ'ê jî ji şerê Kobanî dest pê kir û li Baxozê bi encam bû.

### QSD'ê dawî li damezrînerê DAIŞ'ê Ebû Bekir Elbexdadî jî anî

QSD'ê di çarçoveya pêngava ewlehiyê ya Şikandina DAIŞ'ê de, kampa Baxozê di 19'ê Adara 2019'an de ji destê çeteyan rizgar kir. Herwiha di 23'ê heman mehê de jî piştî 6 heftiyan hêzên QSD'ê karîn çeteyên herî xeternak li ser ewlehiya cîhanê têk bibin. Li gor malpêra fermî ya ragihandina QSD'ê di encama vê pêngavê de ji destpêka sala 2019'an heta 23'ê Adara 2019'an hezar û 879 çete hatin kuştin. Di heman demê de 29 hezar û 600 kes ji çete û malbatên wan xwe radestî QSD'ê kirin û hejmara kesên sivîl yên ku ji kuştinê hatin xelas kirin 37 hezar kes bûn. Piştî 7 mehan ji têkçûyîna DAIŞ'ê, dawî li hebûna serkêş û damezrînerê DAIŞ'ê; Ebû Bekir Elbexdadî jî hat. Kuştina Bexdadî di 27'ê Cotmiha sala 2019'an li bakurê Sûriyê, Idlibê bi êrişeke asîmanî ji aliyê hêzên Amerîkî û QSD'ê ve pêk hat.

### DAIŞ têk çû, lê xeterî hîn didome

Piştî têkbirina DAIŞ'ê li Baxozê, êdî xeteriya DAIŞ'ê li ser herêmê heya astekê baş kêmtir bû. Lê têkçûna DAIŞ'ê dawî li xeteriyê neanî, ji ber bi hezaran kesên xwedî îdiyolojiya radîkal û hovane bûn weke mayîneke demkî nexasim li kampa Holê ku wargehek ji bo firkên terorîzmê, pêre jî kampa Roj. Teqandina zindanên DAIŞ'ê jî metirsiya herî mezin e. Rewşa metirsiyê ya van çeteyan û malbatên wan bi salan didome, hêza QSD'ê bi hemû hewldanên xwe û bi dana zêdeyî 15 hezar şehîd aramiyek li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dabû avakirin. Di heman demê de li hemberî her planeke şaneyên DAIŞ'î operasyoneke berfireh pêk tîne. Lê mixabin bi hatina hikuemta demkî ya Sûriyê HTŞ'ê re şaneyên razayî yên DAIŞ'ê bêtir zindî bûn, lê rewş bi çalakirina şaneyan re sînordar nebû, ji ber piştî salekê ji hatina HTŞ'ê DAIŞ'î ji aliyê wê ve tên berdan.

### Zexta êrişan û hewldana derxistina hemû DAIŞ'yan

Bi van êrişên ku li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê hikumeta demkî ya Sûriyê ve tên kirin, zexteke mezin li ser zindanên ku DAIŞ tê de ne û kampên malbatên wan, hat kirin û hîn jî tê kirin. Hikumeta demkî dixwaze DAIŞ'ê li hemû cihên ku têde têne girtin rizgar bike, mîna Kampa Hol, zindana Şedadê û hwd… çete berdan, di heman demê de armacên derxistina çeteyên li zindan Sînaa ku çeteyên li vir herî xeternak in, dikin. Li hemberî van çeteyan bi salan hêza QSD'ê herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê diparêzin. Bi salan QSD'ê cihê xwe di nava kuwalîsyona navnetewî de digirt ku hemû planên DAIŞ'ê yên li ser herêmê têk birin. Lê mixabin hikumeta demkî nebû demek cihê xwe di kuwalîsyonê de girt û li şûna Sûriyê ji DAIŞ'ê xilas bike, wan derdixe û rê li ber metirsiyeke mezin vedike. Berpirsê vê yekê jî neteweyên yekbûyî ye, ji ber ku ew li hemberî kiryarên ku têne kirin bêdenge û hevkare. Herwiha li şûna ku çeteyên DAIŞ'ê bihata darizandin û ew serbest têne berdan.

### Hemû pêkhateyên Sûriyê para xwe ji komkujiyan girtin

Niha bombeya teqandinê ne tenê ya şaneyên razayî ye, lê ya DAIŞ'yên ku bi salan girtîbûn, heye. Me şahidiya gelek tiştan jî kir ku dîsa çawa şêwazê serjêkirin, kuştin û hişmendiya tûndrew xwe dûbare dike. Dîsa ala reş li ser bajarê Reqa hate hildan, kirasê reş li jinan hate kirin, ev îdyolojiya ku bi salan li hemberî wê şer dihat kirin, îro bi awayekî zelal xwe dide pêş û hikumeta demkî serkêşiyê jêre dike. Gelo hikumeta demkî bi van nêzîkatiyên li hemberî gelê Sûriyê, wê çawa siberojekê ji bo Sûriyê ava bike, pêkhateyek ji Sûriyê nema ku di nava vê salê de komkujî nedît. Hêviyên hemû pêkhateyên Sûriyê ji vê hikumetê hatiye şikestin. Di encamê de ger ev hikumet li ser desthilatdariyê bimîne, wêraniyên ji salên bihûrî zêdetir li Sûriyê wê bên jiyankirin. Herwiha zindîkirina DAIŞ'ê jî avabûna Sûriyeke nû wêran kir. Ji bo wê tenê yên ku dikarin aramiyê bînin sûriyê, hêza QSD'ê û sîstema Rêveberiya Xweser e.

## Dorpêçkirina Rojava û Hesabpirsîna Dîrokî yê Gelê Kurd

**E.Pêjder Altan**

Rojava ku bi îradeya kolektîf a gelan di serdemên herî tarî yên Rojhilata Navîn de hatiye damezrandin, îro ne tenê bi êrîşeke leşkerî, lê di heman demê de bi operasyoneke piralî ya ol, neteweperestî, berjewendiya navneteweyî û durûtiya herêmî bi hev ve girêdayî ne bi tunekirinê re rû bi rû ye. Ev êrîş hesabpirsîneke dîrokî ye ku li dijî hebûna gelê Kurd, destkeftiyên wan ên demokratîk û modela civakî ya herî pêşverû ya herêmê tê kirin.

Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji Şoreşa Rojava vir ve li Rojhilata Navîn modelek civakî ya bêhempa ava kiriye. Xwerêveberiyek piretnîkî û pir-bawerî ku li ser azadiya jinan disekine û bi rêya meclîsên gel dixebite… Ev model bûye alternatîfek zindî ji bo otorîterîzm, mezhebperestî û tundrewiya olî li herêmê. Ji ber vê yekê ye ku ew di bin êrîşê de ye.

Li hemberê vê jî bêdengiya navneteweyî jî gotin di cih de be cilê zirav ê hevkariyê ye. Bi hezaran şervanên Kurd, Ereb, Suryanî, Ermenî û enternasyonalîst di şerê li dijî DAIŞ'ê de jiyana xwe ji dest dan. Ev fedekarî bi bêdengiya ku îro ji hêla Koalîsyonê ve tê nîşandan bi eşkereyî tê înkarkirin. Ev bêdengî ne bêalî ye; ew hilbijartinek siyasî ye ku êrîşkaran cesaret dike û derî ji bo DAIŞ'ê vedike ku dîsa bihêz bibe. Dema ku Tirkiye li hundirê xwe gotinên aştiyê hildiberîne, ew siyaseta xwe ya êrîşkariyê li dijî gelê Kurd bi rêya şerên leşkerî, dîplomatîk û bi wekalet li derveyî welêt didomîne. Bêdengiya civaka navneteweyî li hember vê durûtiyê dibe hevkariyek fiîlî-de facto.

Li aliyê din jî, agirbesta 15 rojî ya di navbera xeta HTŞ û QSD'ê de, ne amûrek aştiyê ye, amûrek e ji bo ji nû ve rêzkirina têkiliyên hêzê li ser erdê. Li Sûriyeyê, agirbest êdî nayê wateya bêdengkirina çekan, dibe rêyek e ji bo aktoran ku dem qezenc bikin. Ji aliyê Amerîkayê ve, ev agirbest ev stratejiyek e ji bo pêşîgirtina li windakirina serweriya xwe an jî kontrola xwe ye. Ji bo HTŞ'ê, ew cîhek bêhnvedanê ye. Ji bo Şamê, ew derfetek e ku xwe ji nû ve bi cih bike. Ji aliyê din ve, QSD jî ne tenê hêzek leşkerî ye; ew aktorê herî rêxistinkirî, rewa û demokratîk li ser erdê ye. Ji ber vê yekê, ew hem wekî pêdivî û hem jî wekî avahiyek ku hewce ye were kontrol kirin tê hedefgirtin.

Vekirina deriyê girtîgehên Şedadê û Reqayê, berdana bi hezaran endamên DAIŞ'ê û nebersivdayîna Koalîsyonê ji bo bangên alîkariyê, herêm gihandiye ber karesateke din a mezin. Ev rewş nîşan dide ku êrîş ne tenê ji bo Kurdan, lê ji bo hemî gelên herêmê gef in. Ji nû ve derketina DAIŞ'ê nîşana herî zelal a berjewendiyên hevpar ên eksena Şam-HTŞ-Tirkiye ye.

Kobanê ax… Kobanê! Ji bo dijminan ku buye derdeke bêderman, gotina "Ket ha ket!" di qirka hinekan de bûye dasiyek pehn çikiyaye, ji bajarek wirdetir e. Ango bajarek ne ji rêzê ye; ew semboleke cîhanî ya berxwedana bi pêşengiya jinan e. Êrîşeke li ser Kobanî dê azmûneke astengkirinê ya Amerîkayê be, ji bo siyaseta navxweyî û derve ya Tirkiyeyê li ber şikandinê be û pevçûneke eşkere ya Îslamîst-sekuler be ku dewletên Ereb ji eşkerebûna wê ditirsin. Ketina Kobanî dê ne tenê şikestina bajarekî be, lê di heman demê de şikandina îdîaya azadiyê jî be. Rojava ronahiyek e ku li cihê ku tarîtî herî dijwar e tê ronîkirin. Li vir, hêvî ne hestek e, lê çalakiyek kolektîf e. Gavên azad ên jinan, çavên zarokan ên ku li sibê dinêrin, wêrekiya gelên ku li kêleka hev radiwestin… Li van axan, hêvî bi biryardariyek mezin dibe ku ji dengê bombeyan derbas dibe.

Çawa ku Sedam di salên 1980'an de kir, îro neteweperestên Ereb ên selefî Sûreya Enfalê wekî motîvasyonek ji bo qirkirina li dijî Kurdan bikar tînin. Ev yek ji mînakên herî xeternak e ku ol vediguhere amûrek neteweperest. Bikaranîna Sûreya Enfal ji aliyê Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê ve wekî motîvasyonek ji bo êrîşê nîşan dide ku çawa xetên Baas û Selefî di dijminatiya xwe ya li hember Kurdan de yek in.

# Lêkolînerê Misrî di Karûbarên Terorê de: HTŞ'ê DAIŞ'ê hembêz dike

Lêkolînerê di Karûbarên Terorê de Munîr Edîb da zanîn ku hêza bi fedekarî DAIŞ şikand QSD'ê bû û got, "Tenê QSD'ê dikare şerê li dijî DAIŞ'ê bide meşandin û parastina zindanên DAIŞ'ê û kampên malbatên çeteyan bike. Herwiha îro em dibînin ku desthilata nû ya Sûriyê di berdewamiya şerê li dijî QSD'ê de çeteyên DAIŞ'ê hembêz dike."

**Hemza Sêvo**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê êriş li ser QSD'ê tên domandin. Di nav van êrişan de bi hezaran kesên tundrew û çeteyên DAIŞ'ê ji zindanan direvin û dibin xeteriyeke pir mezin li ser ewlehiya herêmê. Derbarê heman mijarê Lêkolînerê di Karûbarên Terorê de Munîr Edîb ku ji Mesrê ye bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Piştî ku Baxoz ji aliyê Hêzên Sûriyaya Demokratîk ve hate rizgarkirin, Sûriyê û tevahiya cîhanê serdemeke aram derbas kir, bi piranî ji gefa DAIŞ'ê (ji bilî şane û tevgerên wê). Lê belê bi hatina HTŞ'ê li Sûriyê, nîşaneyên tundrew û bermahiyên DAIŞ'ê li Sûriyê bi awayekî vekirî hatin eşkerekirin. Hûn tevgerên DAIŞ'ê di bin vê desthilatê de çawa dinirxînin?**

Rast e DAIŞ hilweşiya, ji hêla Serokê Amerîkayê Donald Trump ve di serdema xwe ya yekem de di 22'ê Adara 2019'an de hate ragihandin ku DAIŞ têkçûye, û Hêzên Sûriyeya Demokratîk roja din, 23'ê Adara 2019'an, têkbirina çeteyên DAIŞ'ê ragihand. Lê, ev rêxistin bi rengek ku ew bi tevahî ji holê rabe pêknehat. Bingeha wê ma, ev yek jî ewlehiya Sûriyê xist metirsiyê. Ji ber hebûna şaneyên veşartî ku hin ji wan çalak in, ji bo ewlehiya tevahiya cîhanê xeternak e. Ev şaneyên veşartî heta roja îro jîzêdetirî şeş sal piştî ragihandina hilweşîna DAIŞ'ê dixebitin. Komên çekdar û rêxistinên radîkal ên din ji nêz ve bi DAIŞ'ê re bûn ji hebûna vê rêxistinê sûd wergirtin. Rewşa Sûriyê, an jî şarê berdewam ê di navbera desthilata Şamê û Hêzên Sûriyeya Demokratîk de a ku di demekê de berpirsiyarê parastina van girtîgehên DAIŞ'ê bû, aloziyekê diafirîne. Hebûna endamên DAIŞ'ê, çi di girtîgehan de û çi jî di kampan de, nîşan dide ku krîzeke rasteqîn di derbarê van kesan de heye. Sûriyê ji wan kesên xwedî fikrên radîkal û cîhadîst re bû cihekî guncav û bi ewle. Rast e ku ev desthilat ji bo şerê li hemberî DAIŞ'ê beşdarî Hêzên Hevpeymana Navdewletî bû, dibe ku hikumeta demkî ji bo şerê li dijî rêxistinê dixwest, lê mijar ew e ku gelo vê hikumetê şerê rêxistinê û îdeolojiya wê kir? Ma ev çêbû? Ez ji vê mijarê bi guman im û ez dibînim ku hikumeta demkî piştgirî daye vê rêxistinê. HTŞ'ê an jî desthilata niha dayika terora DAIŞ'ê ye û wê ji hemû aliyan ve hembêz dike, hem jî berevaniya wê erkekî xwe dibîne.

**-Kobaniya ku DAIŞ têkbir û bû keleha destpêka dawîbûna DAIŞ'ê, îro jî rastî êrîşên çeteyên hikûmeta demkî ya Sûriyê ya ku dagirkeriya Tirk piştgirî dike, tê, gelo ev tolhildan e, yan planeke stratejîk a wan e?**

Li Kobanê berxwedaniyeke mezin rûda, tê de Hêzên Sûriya Demokratîk bi awayekî efsûnî li ber xwe da û bi ser ketin di rûbirûbûna rêxistinê de, hucreyên di nav bajêr de ji holê rakirin, her wiha şaneyên veşartî yên ku hewl didan ji nû ve bikevin tevgerê, hilweşandin. hikûmeta Sûriyê ya sekinî, bi piştgiriya Tirkiyê, dibe ku şêweyeke tolhildanê li dijî hêzên ku rû bi rû bi DAIŞ'ê re rû bi rû bûne, û her weha wek mînak be, ji bilî hewldana wan a ji bo avakirina hebûna li vî bajarî, ku dibe ku kampanyaya girîng û berbiçav a Hêzên Sûriyeya Demokratîk li dijî rêxistina herî xeternak li ser rûyê erdê nîşan dide. Kes nikare rola Hêzên Sûriyeya Demokratîk di têkoşîna li dijî DAIŞ'ê de înkar bike, ev şerê ku di berdêla wê de 15 hezar şehîd bûn feda. Hêzên Sûriyeya Demokratîk hîna berdêlan didin û rola wan di parastina girtîgehên ku endamên DAIŞ tê de hene berdewam e. Ev rol nîşan dide ku QSD'ê xaka xwe diparêze û ev jî welatparêziya wê û berpirsyariya wê ya girîng di şerê de nîşan dide. Ev jî tekez dike ku ew ji bo parastina cîhanê di her du aliyan de bi terorîzmê re rû bi rû bûn. Piştî rizgarkirina Baxozê, ev têkoşîn domand, êdî bû erkdar li ser parastina zindanên çeteyên girtî û kampên malbatên DAIŞ'iyan.

**-Îro hin navendên binçavkirinê yên çeteyên DAIŞ'ê û malbatên wan, çi li girtîgehên Reqayê an jî ya li Şedadê û heta Holê jî di bin parastina hikûmetê de ne.**



**Di demekê de ku dîmen û daxuyaniyên fermî derketin holê ku hikumet bi xwe êrişî wan navendan kir da ku girtiyan azad bike? Ev yek li Hol, Navenda Eqtan û yên din li Reqa û Şedadê pêkhat. Gelo heya çi radeyê ev hikumet dikare ewlehiyê ji zindîkirina DAIŞ'ê biparêze?**

Di baweriya min de hêza ku bikaribe çeteyên cîhadîst û malbatên wan kontrol bike Hêzên Sûriyaya Demokratîk e, ji ber ku ew xwedî tecrûbeya berfireh di parastina van navendên binçavkirin û girtîgehan de ne. Konteksteke din jî heye ku girîngtir xuya dike ku ji bo parastina van girtîgehan QSD'ê hêza herî guncav e, ji ber ku wan bi awayekî profesyonel li dijî DAIŞ'ê şer kiriye, bi rêya vê yekê ew bi ser ketin û DAIŞ ji holê rakirin. Ji ber vê yekê yên ku rêxistinê têkbirin, yên xwedî fikrekî azad in pêşengiya şerê terorê dikin û şeran bi wêrekî bi rêve dibin, dikarin navendên binçavkirinê biparêzin. Ji aliyê din ve, kesên ku tevlî terorîzmê bûne, an jî pêwendiya wan bi terorîzmê re heye, bê guman dê zehmetiyan derxînin, bi taybet di warê kontrolkirina girtîgehên çeteyên DAIŞ'ê de. Ev yek kirîzeke xeternak e, dibe ku hikûmeta Sûrî ya nû van kesên tundrew serbest berde Lê dîtineke din heye ku dibêje ev kesên tundrew û malbatên çeteyên DAIŞ'ê wê veguherin xaka Îraqê.

**- Gelek analîzan nîşan didin ku planeke navdewletî heye ku di navbera Sunnî û Şîeyan de şer derxîne, Îraq ji vê ditirse û dixwaze xwe li dijî wê biparêze. Armanca navdewletî çi ye ku şer li Îraqê wekî beşeke girîng a Rojhilata Navîn ji nû ve dest pê bike?**

Ji bilî van analîzan texmîn hene ku Nûrî Malikî serokatiya Îraqê bike dîse. Di dema Nûrî Malikî de, çeteyên DAIŞ'ê serkeftî bûn, karîbûn paytexta xwe li Mûsil û Sûriyê ava bikin. Nûrî Elmalikî vedigere û dibe ku DAIŞ bi wî re vegere, ku dibe vegera wî û DAIŞ'ê bibe sedema derketina



şerekî mezhebî. Îraq di rewşeke zehmet de ye ji ber hebûna heman rêberê ku di serdemeke bûrî de axaftina tundrew kiribû. Axaftina wî bûbû sedema derketina DAIŞ li Îraq û Sûriyê. Ew xîtaba radîkal hişt ku şîniyên Mûsilê pêşwaziya DAIŞ'ê bikin, ji ber vê yekê li gorî min ev tirs heye û dibe ku encamên xerab bi xwe re bîne.

**- Hikumeta ku hat li ser desthilatdariyê, komkujiyan li dijî gelên Sûriyê didomîne, destpêkê li ser Elawiyan, paşê Durziyan û piştre gelê Kurd. Ew heman kiryarên DAIŞ'ê dike, herweha hemû cûreyên xerab ên îşkence, lîstina bi laşê mirovên şehîdbûyî û hwd… heta çi astê gelên Sûrîyê baweriya xwe bi vê hukumetê bîne?**

Di roja îro de gelên Sûriyê êdî baweriya xwe bi hikumeta demkî ya Sûriyê winda kirine ji ber ku vê hikumetê komkujî li ser wan de pêkanîne. Di serî de li ser Elewiyan kumkujî pêkanîn, paşê Durzî dan ber qirkirinê, herî dawî komkujiyan derheqê Kurdan pêktînin. Her kesê ku xwedî nerîneke cuda be ji ya hikûmeta demkî rastî binpêkirinan tê. Ev desthilat xwedî pirsgirêk e, di warê siyasî û îdiyolojî de ew aliyekî ji bilî xwe qebûl nake, bi hemû pêkhateyên Sûriyê, ol û baweriyên cuda re bi radîkaliyet tevdigere. Ev terz wê rê li ber bidestxistina aramiyê û berdewamiya hebûna wê bigire. Ew hetanî bi bijartinên ku dide pêşiya gelên Sûriyê tundrew e. Di heman demê de serketina xwe li ser hesabê gelên Sûriyê dike. Ev desthilat dikare bibe sedema nebûna îstîkrarê. Eger ev hikumeta demkî wiha tevbigere bêyî ku xwe biguherîne wê gelek komkujî çêbibin û tu carî wê ewlehî pêkneyê.



# Kurdan bi berxwedaniya xwe destanên lehengiyê nivîsandin (3)

Şêxmeqsûd û Eşrefiyê keleha berxwedanê û cihê fedayiyan e. Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi berxwedaniya xwe dengê gelê Kurd kirin yek û mohra qehremaniya Kurdan li dîrokê dan.

**Aryen Hesen/Qamişlo**

Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi berxwedaniya xwe ji destpêka Şoreşa Rojava ve destanên lehengiyê nivîsandine. Di dîroka gelê Kurd de hertim berxwedanî para serkeftinê ye. Dewletên mezin li ser serê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bûn yek, li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi berxwedaniya xwe dengê gelê Kurd kirin yek. Şêxmeqsûd û Eşrefiyê têkneçûn, lê belê berxwedaniya gel û têkoşîna şervanan biserket.

**Peymana 1'ê Nîsanê**

Di 1`ê Nîsanê de, di navbera Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê û nûnerên hikûmeta demkî ya Sûriyeyê, li Helebê peymanek derbarê taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de hat îmzekirin. Peyman ji 14 xalên sereke pêk tê, di nav de xurtkirina jiyana hevbeş, parastina şêniyan, derxistina hêzên çekdar û birêxistinkirina Ewlehiya Hundirîn. Di nava xalên lihevkirinê de hat gotin ku ji bo pêkanîna peymanê pêwîste komîte werin avakirin.

**Di êrîşa destpêkê de berxwedaniya gel bi serket**

Di 6'ê Cotmehê de gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yê Helebê li hemberî dorpêçê bi sedan berê xwe dan bendên axê yên ku ji milê hikumeta demkî ya Sûriyê ve hatibûn danîn û li hemberî girtina rêyan û dorpêçê xwepêşandan li dar xistin. Li hemberî çalakiya gel, hêzên hikumetê jî bi gaza îsotê û panzêran êrîş kirin, ji ber van êrîşan gelek kes birîndar bûn. Lê gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê gavekê bi paş de venegeriyan, lê belê bi sekin û berxwedaniya xwe hiştin ku çeteyên girêdayî hikumeta demkî bi paş de vegerin. Li wê derê û di wê demê de berxwedana gel li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li hember dagirkeran bi serket. Herwiha di wê demê de peymana 1'ê Nîsanê ya ku di navbera Meclisa Giştî ya Taxên Şêxmeqsûd-Eşrefiyê yên Helebê û nûnerên hikûmeta demkî ya Sûriyeyê ve hatibû imzekirin hate binpêkirin.

**Careke din hewildan vîna gel bişkînin**

Di 22'ê Kanûnê de ji aliyê hikumeta demkî ve êrîşeke giran bi ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de hat. Bi çekên giran êrîşî herdû taxan kirin. Herwiha bi awayekî bê serûber û bi rengekî hovane êrîşî gel dikirin. Di encama van êrîşên hovane yên li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê jina bi navê Fedwa Mihemed El Kurdî (57) salî ya ji pêkhateya Ereb şehîd bû û 19 sivîl û du endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn birîndar bûn. Lê dîsa jî û li gorî êrîşên giran gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dest ji taxên xwe bernedan û li pişta Hêza Ewlekariya Hundirîn li berxwedan. Herwiha bi israra gel û têkoşîna şervanê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê careke din li hember êrişên komên çete û dagirkeran û hikumeta demkî bi serketin, careke din hikumeta demkî lihevkirina ku di 1'ê Nîsanê de hatiye kirin binpêkir û êrişên xwe yên hov domandin.

**Êrîş piştî civîna li Firansayê pêkhat**

Di 4'ê Çileya 2026'an de Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mazlûm Ebdî, Endamên Fermandariya Giştî ya QSD'ê Sozdar Hacî û Sîpan Hemo derbasî Şamê bûn. Piştî bi dawîkirina hevdîtinê raghandina QSD'ê diyar kir ku ji bona pêkanîna peymana 10'ê Adarê wê nîqaş û hevdîtin berdewambikin. Lê di dema ku civîn di navbera Hêzên Sûriya demokratîk û hikumeta demkî de çêdibû di nivî de hate seknanadin û hikumeta demkî gotin ku wê di 8'ê Çileyê de civînê berdeman bikin û nîqaşên ku hatine kirin wê werin ragihandin û îmzekirin. Lê piştî wê di navbera 5-6'ê Çile de li Fransa di navbera Emrîka, Îsraîl, Sûriyê û Fransa de hevdîtimek hate kirin û piştî wê êrîşên li ser Taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hate destpêkirin, di wê demê de hate xuyakirin ku wan çira kesk bidestxistiye ji ber vê yekê êrîş kirin.

**Di 6'ê Çile de êrîşa hovane destpêkir**

Piştî wê di 6'ê Çile de êrîşeke hovane li ser herdû taxên şêxmeqsûr û eşrefiyê pêkhat. Bi hemû rengên çekan li ser gelên ku li herdû taxan diman komkujî pêkanîn, lê berxwedaniya gel ji van êrişan mezintirbû. Êrîşên ku li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêkhatin gelek giranbûn, lê berxwedana ku hatî jiyankirin cîhan tev matmayî hişt. Êrîş ji 6'ê Çile heya 10'ê çileya 24 seatan bê navber berdewam kir, lê li beramberî wê têkoşîna Hêza Ewlekariya Hundirîn û baweriya wan bi ramanê Rêber Apo û parastina gel bû bersivek mezin ji dijmin û tevahî cîhanê re.

Di êrîşa li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê re du dewletên mezin hebûn herwiha alîgirên wan dewletan jî hebû. Dewleta Tirk ku yek ji hêzên NATO yê ye êrîşê ser du taxên biçûk kirin, ku di wê demê de berxwedana 300 têkoşer li hember 42 hezar çete û piştevaniya hin dewletên din. Lê hejmara çeteyan ji bo şervanên me ne derd bû û bi tirs bû, lê belê ew ji şervan û têkoşerên me ditirsiyan. Herwiha di wê demê de Hêza Ewlekariya Hundirîn biryara berxwedanê girtin û diyarkirin ku teslimiyetê qebûlnakin û wan biryara mirinê daye. Di Helebê de şervanên Hêza Ewlekariya Hundirîn bi pêşengtiya Fermandar Ziyad Heleb biryara serkeftinê dan, fermandar Ziyad bi sekna xwe ya têkoşînê muhra xwe li dîroka gelê Kurd da.

**Çalakiyê Fedayî**

5 qehremanên Kurdistanê li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê teslimiyet qebûlnekirin û heya kêliya dawî li hember dijmin ji bo parastina gelê xwe di nava şer û berxwedanê de bûn. Ew 5 hevalên fedayî ên bi navê Hawar, Dilbirîn, Faraşîn, Denîz, Rojbîn, navê xwe di rûpelên dîroka qeremaniyê de bi xwînê xêzkirin.

Herwiha di encama wan êrîşan de gelek birîndar û şehîdên sivîl û Hêza Ewlekariya Hundirîn hene ku heyanî vê kêliyê hejmara wan nayê zanîn, di heman demê de gelek kes di Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de hatine revandin û hin kes jî winda ne.

Piştre ji ber êrişên zêde û rewşa awarte ya ku sivîl tê re derbas dibûn û bi zêdebûna birîndaran, di navbera hikumeta demkî û Hêzên Sûriya Demokratîk de piryara agirbestê hate ragihandin û birîndarên ku di nexweşxaneya Xalid Fecir ya dikeve li taxa şêxmeqsûd derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn û peyre jî hejmarek sivîlên ku derbasî nexweşxaneyê bûn ew jî bi rengekî bi ewle derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn.







**Bîra Civakê**



**Di civakê de pirsgirêka zayendperestiyê**

Ehmed Hesen

Zayendperestiya civakî, pirsgrêkeke civakî ye û bingeha wê jî bi teşeya cudavaniya arasteyî jinan derdikeve holê. Guhertina sîstema koledar a ji aliyê zîhniyeta baviksalariyê ya bi hezaran salan ve hatiye avakirin, bi qasî tê xuyakirin hêsan nîne. Ev zihniyet di encama tunekirina zayendekê li ser hesabê mezinkirina zayenda din pêş ketiye. Ji derketina sîstema baviksalar de bigire heta qiraliyetê, ji dewletdariyê de bigire heta sîstema îro ku di bin navê kapîtalîzma global de xwe sîstematîze dike de pirsgirêka zayendperestiyê nehatiye çareserkirin, berovajî wê her tim weke topa berfê tol dibe û mezin dibe, di serê vê pirsgirêkê de jî hebûn û kesayeta jinê tê armancgirtin. Ez li vir zayendîtiyê bi pirsgirêk nabînim, lê feraseta ku zayenda mê û nêr xistiye nava şerê desthilatdarî û serweriyê armanc dike civakê bi temamî ji hev du qut bike û di şexsê jinê de civakê biçewisîne û di şexsê zilam de jî hêza iqtîdarê berfireh bike. Ji malbata ku bi şêweya xwe ya dewletdariyê ava bûye, heta eşîre û komên mezin em rêûresmeke çînîtiyê ya bê dawî dibînin, hem di aliyê madî û manewî û hem jî di aliyê feraseta baviksalar de ev yek bi awayekî berbiçav tê dîtin, di serî de parçekirina zayendî di bin navê parastina namûsê di kesayeta jinê de hatiye teşhîrkirin û weke pirsgirêkeke ku tenê jin pêre têkildar e hatiye teşhîrkirin, di heman çarçoveyê de vê pirsgirêkê taybet li welatên radîkalîst ên weke Îran, Turkiye û Sûriye û gelek welatên din rê li ber pêşketina zîhniyeta hevpar a jin û zilam girtiye û bi zagonên ku rewa kirine jin hem di aliyê zayendî ve hem jî aliyê çandî ve dane dorpêçkirin û weke ku serdema qiraltiya zilam e, sîstemên xwe wiha teşhîr dikin, her çend hebûna jinê di nava sîstema xwe de bigirin jî, lê ji hebûneke zayendî ya ku weke amûr lê tê mêzekirin wêdetir naçin. Di nava civakên Rojavayî de jî van pirsgirêkan bi şêweyên cuda xwe dane pêş, di serî de di bin navê wekheviyan de xwebûna zayendî ji jinê hatiye standin û di bin navê saziyên parastina mafên jinan de xizmeta mezin ji zîhniyeta kapîtalîst re tê kirin, hêzên rojavayî bi qasî binpêkirinên xwe yên bi demokrasiyê cîlakirî azadiya civakê parçe parçe kirine, zayend ne weke hebûneke mirovî, berovajî wê weke amûra zêdekirina zarokan bingeh girtine û bi vê re jî dixwazin serjimariya hemwelatiyên xwe zêde bikin û fînansê mezin bikin, ji bilî ku hesabê ji têkbirina hewîrdora xwezayî, mezinkirina bêkariyê di nava civakê de û pêşketina pirsgirêkên tenduristiyê re jî bike. Di encamê de civak di hundir de dane peritandin, hem jî çarenûsa wê ya jiyanî kontrol kirine. Di nava civakê de jî em dibînin ku pirsgirêka zayendê gelekî li pêş e, taybet di bin navê adet û kevneşopiyên civakî de jin bi hêsanî tên qetilkirin, ciwan tên xapandin, di serî de rêgirtina li ber pêşketina zîhniyeta hevpar a di navbera jin mêr de, cudakirina wan, kilîtkirin mejiyê jinan ji aliyê ferasetên olî yên zihniyetperest ve, dûrxistina jinan ji qadên perwerdehiyê û biçûkxistina jinan hemû jî yek ji armancên feraseta baviksalar a ku sîstema kapîtalîst pêşengtiya wê dike ye.

Weke encam ji bo rêgirtina vê feraseta ku civakê dimije divê pêşî civaka demokratîk a hevbeş ku têde mafê zayendî bi awayekî xwezayî tê parastin were esasgirtin. Di heman demê de ancax bi parastina xweseriya her du zayendan û rêzgirtina wan ev pirsgirêk ji holê bên rakirin.